Şopdara Rastiyê ye
**Ronahî**
Rojnameya siyasî, civakî û çandî   Jimar :1315   12-Cotmeh-2025   www.ronahi.net/ku/

**Navnîşan**
www.ronahi.net/ku/   rojnameyaronahi   @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com   Rojnameya Ronahî   +963 984 370 218

# Mûnetê zivistanê yek ji kevneşopiya çanda Kurdî ye

**Diyala Nîdal\Qamişlo**

**Mûneta zivistanê yek ji kevneşopiya çanda Kurdî ye û ev çand ji dîrokê ve heta roja îro ji aliyê jinan ve tê parastin. Her sal di demsala payîzê de jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê mûneta zivistanê çêdikin û sebzeyan hişk dikin. Herwiha jin nava bexçe, bermal û serbanên xwe bi sebzeyan hişkbûyî dixemilînin.**



Her sal di demsala Payîzî de jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikevin tevgerê da ku xwarinên zivistanê anjî mûneta zivistanê amade bikin û di vê demsalê de jin kedek mezin didin. Çêkirina xwarin ên zivistanê ne tenê li ser endamên malbatê ye. Pir caran jin li gel hev kom dibin û bi hev re xwarinên zivistanê amade dikin û paşê li hev parve dikin. Şêwazên kevin di xwarinên zivistanê de bi kar tînin û şêwazên çêkirina bi destan hildibijêrin da ku tama xwarinê biparêzin bêyî ku tu dermanan lê zêde bikin.

Di heman demê de, amadekirina xwarinên zivistanê çandeke kevnare ji aliyê jinan ve tê parastin, gelê herêmê di demsala payîzê de dikevin tevgerê de da ku mûneta zivistanê amade bikin. Herwiha jin di meha payîzê de bi karê çêkirina xwarinên zivistanê anjî mûneta zivistanê re mijûl dibin, wekî ku gotinên pêşiyan dibêjin "Mûneta malê rehetiya cane". Ku di destpêka meha payîzê de jin amedekariyên xwarina zivistanî anjî "mûneta malê dikin". Jin bi vê mebestê zebzeyên wekî bamî, baqil, kundir, îsot,û hwd..zuwa dikin, ji fêkiyan wekî tirî, hejîr û kundir reçel çêdikin. Herwiha tirşî, mekdûs, zeytûn û savar gelek têştên din ên xwerinê amade dikin.

**Amedekariyên mûneta zivistanê**

Mûnet, her cureyên xwarinên ku di demsalên xwezayî yên demsalî de tên parastin da ku hebûna xwe di zivistanê de piştrast bikin. Mûnet hewcedariya mirovên malê salek an zêdetir pêk tîne û her tiştê ku dikare di zivistanê de were xwarin radike. Di heman demê de, jin di dema çêkirina xwarinên zivistanê de hemû cureyên ku jê re tê gotin mûneta zivistanê amade dikin û di nav wan de jî penîr, megdûs, zeytûn, tirşî, miraba, tirî û rûnê malê , dimsa firingan, dimsa îsotan, miloxî, pelên tirî, eyşe xanim, bacana biraştî, ji bilî gelek tiştên din. Yek ji wan mûnetan jî megdûs e, megdûs jî şêwazeke wê yê taybet ji bo hilandinê heye ku destpêkê bacanên reş tên kelandin û di safokan de tên xweykirin û di bin barekî giran de tên zuhakirin du rojan, paşê jî bi gûz, sîr, dimsa îsotên sor tên dagirtin û di mertebanan de tên rastkirin û zeyta zeytûnan li ser tê kirin. Her malek li gorî hejmar û hewcehiya xwe ya salê kîloyên megdûsan zêde yan kêm dike, çêdikin. Herwiha her malek li gorî hezkirina xwe ji tiştan re, mewadên xwe tevlî megdûsan dikin.

**Mûneta malê paqij û bi tendurist e**

Mûnetên malê, ji yên bazaran xweştir û bi tamtir in. Di heman demê de, xwezayî ne û hinekî barê malbatê ji aliyê aborî ve sivik dike. Tiştên bi destan paqijtir in û ji keda destên dayîkan ne, herwiha xwarina hazir hemû dermanên kîmyewî di nav de hene, ne bi tendurist in û buha ne. Lê mûneta malê paqij û bi tenduriste.

Lewma çêkirina mûneta zivistanê weke çandekê hatiye naskirin û tu sal, tu malbat bêyî çêkirina mûnetan derbas nake. Di hin malan de bexçeyên sebzeyan hene, mûnetê xwe yê malê jê çêdikin. Bêhtirî xwe gelê Kurd vê mûnetê zivistanê çêdikin. Li herêma me, hejmareke kêm ji pêkhateyan vê mûnetê zivistanê çêdikin. Ji mûneta zivistanê re dibêjin (xwarinên sivik) ku ew li ser sifreya taştê û şîvê tên danîn. Di dema berê de jî hemû jin û malbat li hev kom dibûn û bi hev re amadekariya zivistanê dikirin û mûnetan çêdikirin. Çêkirina mûneta zivistanê yek ji kovenşopiya çanda Kurdî ye û ev çand ji dîrokê heta roja îro ji aliyê jinan ve tê parastin.

## Gotina Dawî



### Çi li Şamê hat nîqaşkirin?

**Mihemed Seydi**

Di destpêka meha Cotmehê de, şandeyeke Bakur û Rojhilatê Sûriyê li Şamê bû û bi desthilata demkî ya li Sûriyê re civiya. Di vê Civînê de nûnerê DYA yê ji bo Sûriyê Tom Barak û hin fermandarên Amerikî amade bûn. Di heman wextê de, komên ser bi "Wezareta Parastinê ya Sûriyê" ve dor li taxên Kurdan ên li Helebê girtin û dest bi êrişan kirin. Li vir rastî bersiva hêzên Ewlehiya hundirîn û Xelkê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê hatin û şer derket. Tevî ku eşkereye yên van koman dixe tevgerê dewleta Tirk e, lê di fermiyetê de, Ehmed El-Şerie dibêje ev hêz di bin desthilat wî de ne. Di vê civîna ku li dar ketî de, ev êriş mijara sereke bûn û yekser daxwaza rawestandina êriş û dorpêçê hat kirin. Li gorî hin çavkaniyan, ji ber dewleta Tirk di vê civînê de ne amadebûye û nehatiye dawetkirin, xwestiye van êrişan pêk bîne da mesajê bighîne şandeya DYA ku ew dikarin rewşê tevlîhev bikin. Lê ji ber destwerdana hin welatên Erebî û DYA, ev êriş hatin rawestandin û dîsa li ser xala rawestandina şer li tevahî Sûriyê, hat teqezkirin.

Herwiha li gorî hin aliyan, Fermandarê QSD'ê Mezlûm Ebdî ji Ehmed El-Şerie ra gotiye ku ew dest ji daxwaza nenavendîbûnê bernadin û divê di nava rêveberiya Sûriyê de jî pirrengî hebe. Li gorî hin agahiyên taybet, Ehmed El-Şerie ji Fermandarê QSD'ê Mezlûm Ebdî re gotiye ku hin alî ji nava wan meselê xerab dikin û nahêlin danûstandinê bi QSD'ê re herin serî. Ji bo wê jî Şerie ji Ebdî re gotiye ku ew li rê û rêbazekî bigerin da nenavendîbûn pêk were, lê ewê di nava xwe de vê meselê nîqaş bikin. Ji ber aliyên dijber ên di nava Hikumeta veguhêz de, meselê xerab dikin. Herwiha di civînê de Ehmed El-Şerie gotiye ku ew ê Destûra heyî jî bugherin.

Ev gotinên Ehmed El-Şerie ji Ebdî re gotine, ji çend aliyan de mirov dikare binirxîne. An rastî tu kontrola Ehmed El-Şerie li ser van koman tine û encex dikare cihê lê dimîne de xwe biparêze û her di bin gefan de ye, an jî van komên ku êrişî herêmên Rêveberiya Xweser dikin ew li pişt wê ye û wiha dixwaze bide xuyakirin da kes wî sucdar neke. Ger bi rastî jî ne ew e yê ku hertiştî kontrol dike, kê Wezîrê Karê Derve Eseid El-Şîbanî yekser piştî civîka bi Şandeya Rêveberiya Xweser re, şand Tirkiyê? Li aliyê din, çavkaniya Mafê Mirovan a Sûriyê beriya demekê eşkere kir ku di civînekê li bajarê Laziqiyê de, wezîrê Parastinê yê desthilata Şamê Mirhef Ebû Qesra gotiye ku ew dixwazin QSD'ê bixin nava Artêşa Sûriyê û wan li nava Sûriyê belav bikin û dema ew lingên xwe bi cih bikin, ew ê bi carekê ve QSD'ê ji nav bibin.

Dixwazim bibêjim, ger herdû wezîrên herî nêzî Ehmed El-Şerie ne di kontrola wî de ne, wê demê desthilat jî ne di kontrola wî de ye û tu bawerî bi Peymanên bi wan re nayên kirin. Em bala xwe bidin ragihandina Şamê ya fermî, em ê bibînin ku ew çi difikirin. Her roj li ser Ekranên xwe banga kuştina Durziyan li Swêdayê û Elewî li Beravê û Kurdan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikin. Ger Ehmed El-Şerie nikare vê propagandeya tehrîdkirin kuştinê jî rawestîne, wê demê hemû sozên ku dide jî nikare pêk bîne.

## Sudoku:Pirs 61

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | | | | | 6 | 5 | | 4 |
| | | | | 5 | | | | 6 |
| | 9 | | 7 | | | 2 | | |
| | | 7 | | 8 | | 4 | 3 | |
| | 3 | | 5 | | 4 | | 2 | |
| | 4 | 8 | | 2 | | 1 | | |
| | | 2 | | | 7 | | 1 | |
| 3 | | | | 6 | | | | |
| 8 | | 1 | 4 | | | | | 3 |

## Sudoku: Bersiv 60

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 4 | 3 | 7 | 6 | 9 | 2 | 8 | 1 |
| 7 | 1 | 6 | 2 | 5 | 8 | 3 | 9 | 4 |
| 9 | 8 | 2 | 4 | 3 | 1 | 7 | 6 | 5 |
| 3 | 5 | 8 | 1 | 4 | 2 | 6 | 7 | 9 |
| 1 | 9 | 7 | 6 | 8 | 5 | 4 | 2 | 3 |
| 6 | 2 | 4 | 3 | 9 | 7 | 5 | 1 | 8 |
| 4 | 3 | 1 | 8 | 7 | 6 | 9 | 5 | 2 |
| 8 | 6 | 5 | 9 | 2 | 4 | 1 | 3 | 7 |
| 2 | 7 | 9 | 5 | 1 | 3 | 8 | 4 | 6 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Ket nava dev û didanan:**
- Her kes li dij axivî; her kesî êrîş kirê.

**Ketin pêsîra hev:**
- Navbera wan pir ne xweş bû; şerê hev kirin; bi hev çûn.

**Ketin qirika/gewriya hev:**
- Bi hev çûn; di navbera wan de pirsgirêk derket.

**Kevir li lingê kerê me dane:**
- Li dijî me axiviye; derbarê me de tiştên nebaş gotine.

**Kula qilêrê av e:**
- Dijminê gemarê av e.
(Dema yek ji tiştekî ne xweş be derbarê wî de tê gotin)

**Laşê wî dixwere/poçika wî dixwere/ pozê wî dixwere/qûna wî dixwere:**
- Lêdanê dixwaze; şer dixwaze.
(Dema yek li dijî yekî tiştekî dike, yan dibêje yê din wisa dibêje)

**Li deriyê xelkê nede bi mistan, wê li deriyê te bidin bi bistan:**
- Ku tu li dijî hina biaxivî wê ew pirtir li dijî te biaxivin; ku tu hewl bidî zererê bidî hina wê ew zerereke mezintir bidin te; dijberiya xelkê neke da ew jî dijberiya te nekin.

**Mêş li ser dewê tîr datîne:**
- Ji bo tişt, yan kesên hêja ku bela tên serê wan tê gotin.

**Mirov keviran diavêje Birca Belek, navêje selika rîxê:**
- Kesê dewlemend yan jî jîr û jêhatî be li dijî wan tê axaftin.

**Ne pariyê daqurtandinê ye:**
- Dijberiya wî, şerê wî, têkoşîna li hemberî wî ne hêsan e.

**Neynokên xwe li hev dixe:**
- Dixwaze bi hev biçin; keyfa wî bi şerê wan tê.

**Pişta xwe dan hev:**
- Navbera wan ne xweş bû; bûn neyarên hev.

**Raçavê xwe kiriye:**
- Ji xwe re kiriye amanc; ji xwe re kiriye reş.

**Rika wî jê diçe:**
- Jê pir ne xweş e; pir jê aciz e.

*Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî*

## 'Hevrîn perperoka aştî û azadiyê ye'



Hevrîn xelef; Jina ji aştiyê, têkoşeriyê û ji yesmînê hatiye xuliqandin. Bi bedewiya fikir û sekna xwe bû hedefa dijminê mirovahiyê. Dayîka Hevrîn Xelef Yadê Sûad diyar kir ku Hevrîn gihişt asta şehadetê, lê bi sedan destkeftî li pey xwe hiştin ku şûna wê xuya dike.**R-2**

## 'Nenavendîbûn bihêzkirina gel e'

Endama Deseteya Hevserokatiya Meclisa Sûriya Demokrat Şêra Osê tekez kir ku nenavendîbûn ne gefeke, lê bihêzkirina gel e û wiha got: "Nenavendîbûn rêya avakirina sîstemeke medenî û demokratîk e her kes tê de beşdar dibe û rêzê ji cihêrengiya herêmê re dike."**R-4**



Şopdara Rastiyê ye
**Ronahî**
Rojnameya siyasî, civakî û çandî   Jimar : 1315   12-Cotmeh-2025   www.ronahi.net/ku/   Nirx: 500 L.S



## Bi hatina zivistanê re zor û zehmetiyên koçberên Kampa Serêkaniyê zêde dibin

Koçberên Kampa Serêkaniyê bi hatine zivistanê re êş, zor û zehmetiyên wan zêde dibin. Hevserokê Kampa Serêkaniyê Ebdulrezaq Mihemed diyar kir ku pêwîstiya koçberên kampê bi pêdiviyên sereke hene, ji ber vê yekê pêwîst e rêxistinên navdewletî destekê bidin koçberên kampê.**R-6**

# BÊ MUXATABÊ AŞTIYÊ AŞTÎ NE PÊKAN E

Parlementerê DEM Partîyê Amedê Serhat Eren diyar kir ku pirsgirêka herî mezin li hemberî pêvajoya aştiyê, neavêtina gavên berbiçav yên ber bi demokratîkbûnê ji aliyê dewletê ve ye û wiha got: "Bêdengkirina çekan girîng e, lê ev bi tena serê xwe aştiyê misoger nake. Aştî bi rêya zagon û demokrasiyê tê pêkanîn."**R-3**





## Ji çiraxên hunera Kurdî

Dengê hunermend Hesen Dêrikî bû vedenga birînên ku nayên dîtin û alayek ku di asîmanê wijdanê Kurdî de pêl dide.**R-7**



## Mistefa Rêzan: Bi xebatên berê bersiva demê nayê dayîn

Nivîskar û rojnamevan Mistefa Rêzan diyar kir ku niha lêgerînek ji bo avakirina modêleke rêxistinê ya girêdayî Kurdên li Ewropayê dewam dike, ji ber bi xebatên berê bersiva demê nayê dayîn û got, "Ji bo bersivdayîna pêvajoyê, Kurdistaniyên li Ewropa divê şêwazê xwerêxistinkirinê saz bikin û xwe amade bikin."**R-5**



**Nasnameya Kurdî Berdewam e!**
Sînan Cûdî R-4



**Kî Peymana 10'ê Adarê Bin Pê Dike?**
Idrîs Henan R-5



**Hilbijartinên Sûriyê**
Hafiz Ahmet Turhalli R-6

# 'Hevrîn perperoka aştî û azadiyê ye'

Hevrîn xelef; Jina ji aştiyê, têkoşeriyê û ji yesmînê hatiye xuliqandin. Bi bedewiya fikir û sekna xwe bû hedefa dijminê mirovahiyê. Dayîka Hevrîn Xelef Yadê Sûad diyar kir ku Hevrîn gihişt asta şehadetê, lê bi sedan destkeftî li pey xwe hiştin ku şûna wê xuya dike.

**Ayşa Silêman/Dêrik**

Di derbarê salvegera şehadeta Hevrîn Xelef û kurtejiyana wê Dayîka Hevrîn Xelef Yadê Sûad bersiva pirsên rojnameya me dan, hevpeyvîn wiha bû:

**-Hevrîn Xelef kesayeteke Çawa bû û jiyana xwe bi çi rengî derbas kir?**

Ji ber ku ez keçek bi tenê ya dayîka xwe bûm û min ew hest jiyan kiribû ku bê xwîşk bim, min nedixwest keça min Zozan jî wî hestî jiyan bike. Lewma her tim xwesteka min ew bû ku keçeke din ji min re çêbibe. Di 15'ê Mijdara sala 1984'an de xwedê ew xwestek bicih anî û Hevrîn da min. Hevrîn di xwedê dana xwe de yasmîn bû, netenê kêfa min û keça min Zozan hat lê tevahiya malbatê bi hatina wê şa bûn. Hevrîn bi hezkirin mezin bû û xalê wê nav lêkir, ji refa 1'ê ya yekem derdike heya refa 9'an. Di refa 5'an de rêveberê dibistanê daxwaza wê kirin ku tevlî pêşbirka bîrkarî bibe û têde ya yekem derket. Hevrîn berê xwe dida çi serkeftî bû, ji ber ku gelekî çalak û kesayeta wê xurt bû. Dema bû refa 6'an daxwaz ji min kirin ku ew tevlî koma Cûdî bibe û têde şanoyekî pêşkêş bike û rola parastina mafê mirovan bilîze.

Di her sê refên navîn de jî ya yekem derket her tim rêveberên wê digotin ji ber zîrekbûna wê, em deyîndarê Hevrîn in. Ji refa yekem heya dawiya temenê xwe Hevrîn ji heval û derdora xwe hezdikir û destek dida wan bi kûve diçû şopa xwe dihişt. Dema Hevrîn refa 12'an bû Meclisa Malbatên Şehîdan şehadeta keça min Zozan ragihandin, ev yek bandor li kesayeta Hevrîn kir ji ber ku ew refa 2'an bû dema xwîşka wê tevlî refên Gerîla bû, Hevrîn di nameyekî de jê re gotibû ez ê zû xwendina xwe bidawî bikim da ku werim bighim te. Dema Zozan şehîd ket min ji Hevrîn re got ez xwîşka te û tu dayîka minî em ê tu carî şopa Zozan bernedin. Hevrîn di refa 12'an de Endeziyariya Medenî jê re derket, lê wê dixwest bibe bijîşk ji ber ku hertim digot ew kesên di Helebça de birîndar bûyîn divê ez wan derman bikim. Sala din careke dî refa 12'an xwend 25 pile zêdetir anîn lê ji ber şehadeta xwîşka wê rêjîmê bawernameya wê radestî wê nekir. Êdî Hevrîn berê xwe da Helebê da ku Endeziyariya Medenî bixwîne, li wir hevala hevalên xwe bû ferq û cûdahî nedixist di navbera netewan de.

**-Dema Hevrîn Xelef cihê xwe di nav rêxistinê de girt, çi kar û xebat da meşandin û roleke çawa lîst?**

Piştî derçûna Hevrîn êdî hikumetê serlêdanên xwe ji mala me qut nedikirin rojane dihatin dixwestin ew bi wan re kar bike, lê bi tu şêwazî nekarîn wê iqna bikin. Hevrîn di sala 2010'an de di şaredariyê de dest bi kar kir. Di sala 2011'an de dema Şoreşa Rojava dest pêkir Hevrîn cihê xwe têde girt. Destpêkê Yekîtiya Xwendekaran avakir, êdî Saziya Nûrî Dêrismî li gundê Pirikê vekir û bû berpirsiyara wê, yekem perwerde li wir da. Bi vî rengî çend cih bi rêkûpê kirin û rêxistinê jê dixwest ku radestî wan bike, êdî berê xwe da xedemata û beşek jê kir Akademiya Nûrî Dêrismî û heya roja îro jî ew akademî vekiriye û odeya wê hîn heye li wir. Piştî ku elektrîk ji bajarê Dêrikê qut bû êdî Hevrîn bû Cîgira wezîrê elektrîkê di Saziya Elektrîkê de, da ku ji bo tevahî bajar cenetoran deyne û ronî bike. Rêjîma Baas kîn ketibû dilê wan de ku çima Hevrîn qebûl nekiriye bi me re kar bike lewma berê xwe dan nav zeviyên me û hemû şewitandin. Êdî Hevrîn biryar da ku wezareta aborî ava bikin da ku rê li pêşiya şewatên bi vî rengî bigre. Dema ji min re got ez ê berê xwe bidim wezareta aborî min jê re got tu û hevalê Aras li ser tu dînî nasekinin her çend mehan berê xwe didin cihekî, ji min re got heger em bidestê xwe ava nekin kes nayê ava nake.

Du salan cihê xwe di wezareta aborî de girt, êdî gelek destkeftiyên şoreşê çêbûn sazî, meclis, şaredarî û deste hatin avakirin. Min ji Hevrîn pirsî sedem çiya ku ev demeke te cihê xwe neguhertî, ji min re got hevalan gotiye ji cihê xwe neçe paşê em ê te rêkin cihek din. Dema biryar hat girtin ku divê Partiya Sûriya Pêşerojê were avakirin û Hevrîn pêwîste bi vî erkê rabe, êdî Hevrîn berê xwe da nav netewên Ereb bi mehan di nav wan de dima û mal bi mal digeriya û serlêdana mala dikir û ew perwerde dikirin. Di sala 2018'an de konferans çêbû û Hevrîn hat hilbijatin ku bibe Sekerterya giştî ya Partiya Sûriya



Pêşerojê. Jinek Kurd bi vê temenê piçûk û bi vî rengî evqas kar û xebat da meşandin û xwedî rol û ked bû, wek strîkî di qrika dijmin de bû, bi taybet di qirika Erdoxan de. Hertim kemîn jê re çêdikirin û mît ji derdora wê xilas nedibûn.

**-Şehadeta Hevrîn Xelef bandoreke çawa li pey xwe hişt?**

Roja ku Hevrîn berê xwe da Hesekê çend caran xatir ji min xwestin, hîs dikir ku wê nema veger. Ji Dêrikê heya Hesekê min têkilî pêre dikir heya ku gihişt, dema gihişt ez bixew ve çûm min dît ku vaye Zozan di xewnê de serê xwe daniyê ser milê min dema min çavên xwe vekir min hîs kir ku Hevrîn tiştek hatiye serê wê. Piştî wê telefona min lêda û hin kesên Ereb diaxivîn min zanî ku Hevrîn çû. Raste Hevrîn nehazire lê her quncikek di malê de şopek wê heye, min hemû tiştên wê li cem xwe hiştine bîranîn, ji roja ku çêbûyî heya gihişt asta şehadetê hemû tiştên girêdayî wê di odeya wê de ne û rojane ez li wan dinêrim. Di 12'Cotmeha sala 2019'an de çeteyan kemînekî hovîtî ne li pêşiya kesayeta Hevrîn danîn, lê li pêşiya fikrê wê danîn. Jinek wek wê di 6 salan de evqas destkeftî kirin û bajar sererast kirin, bû kelemek li pêşiya wan dixwestin wê tune bikin. Di şexsê Hevrîn Xelef de dixwestin têkoşîna jinê tune bikin û jinê bitirsînin da ku gavan şûn de bavêjin. Dema ku ew kemîna hovîtî di derheqê Hevrîn de pêk anîn, hemû jinan li herçar parçeyên Kurdistanê û ji derveyî Kurdistanê bang kirin ku em Hevrîn Xelef in û em ê têkoşîn bikin heya ku ew armancên ku wê destpê kirî û niha ji me re mayî em bighînin serkeftinê û azadiya jinê bidest bixin.

Dijmin nehiziriye ku ev jin şagirtê kîne û mamosteyê jina kiye û perwerde li berdestê kî dîtine. Ne gihiştiye wê baweriyê ku teslîmkarî li cem jinê nîne, dagikeriya Tirk jin di zindana xwe de parçe parçe kirin jî lê ji gotinên xwe nehatin xwarê. Ez wek dayîka Hevrîn û wek hevaleke wê ji ber ku 7 salan min û wê bi hev re kar kiriye, jê re dibêjim serê xwe bi rehetî deyne bila Erdoxan û çeteyên xwe baş bizanibe têkoşîna ku Hevrîn dayî destpêkirin ez û hemû jinan em ê berdewam bikim. Şoreşa Rojava bi navê jinê hatiye damezrandin û wê bi navê jinê biser jî bikeve. Her tim Hevrîn tanî ziman ku ew parçekirina Sûrî naxwazin û avakirina Sûrî dixwazin. Heya ku ew hikumeta demkî kujerê Hevrîn dadgeh neke û li pêşiya herkesî wî darveneke tu kes nikare baweriya xwe bi desthilatdariya wî bîne. Ew axa pîroz a ku bi xwîna şehîdan hatî ava kirin ji lingê wan yê qirêj re namîne. Jinê barek giran girtiye ser milê xwe û ne bi îradeya jinê be Sûrî ava nabe.

# Nameya ku Rêber Apo ji bo Jineolojî şandiye bo me çi rave dike?...(1)

**Îsyan Karadeniz**

Gelek caran em tiştekî xeyal dikin, daxwazên me çêdibin û em hewl didin ku vê ya bidest bixin. Gelo dema ku em rast li astengiyekî ve tên çi dikin?

Rûxmê hemû zor û zahmetiyan çiqasî di xeyalên xwe de israr dikin û ji bo xwe gihandina vê xeyalê çiqasî têdikoşin?

Serokatî her tim bal kişandiye ser xeyalên xwe yên zarokatiyê û got min tu caran ixanetê xeyalên xwe yên zaroktiyê nekir û heya roja iro jî ji bo pêkanina xeyalên xwe yên zarokatiyê tu caran dev jê têkoşina xwe berneda ye. Ew bi xeyalan ve ket rê, nakokiyên xwe yên li hemberê jiyanê heyî vegûherand pivanekî jiyanê û kesayetekê sosyalist di xwe de avakir.

Çi bû xeyalên Serokatî? Çi hebu di van xeyalan de?

Name ya ku Serokati ji bo Jineolojî nivisandiyê de wûha tîne ser ziman;“ Min ji zarokatiya xwe ve hewl da ku ez bibim heval û rêhevalê jinê yê herî baş. Di têkiliya min û dayîka min de jî, lêgerîna min a ji bo jina azad dikare were dîtin. Ez girêdayî xeyalên xwe yên zarokatiyê mam, bi wî rengî min jiyan kir û têkoşîna azadiya jinê derxist holê. ''

Heya niha jî daxwaza Serokati ev e ku bi hevalên xwe yên zarokatiyê ve biçe ser kaniyan, di nava gund de bi van re bigerê û wana fêrî listokên nû bike. Bi jinan re di welatekî azad de meşa azadiyê bike. Dema em têkoşina Serokatî ya 52 salan dinêrin dibinin ku her tim li dora xwe zarokên welatê xwe komkiriye û bi van re bi rêgezên jiyana kominal û azadixwaz daniye. Serokati hestên xwe yên di vê derbarê de ji di name ya xwe de bi vê awayî tîne ser ziman; ''Pêwîste bê zanîn ku min her tim xwest jin bijîn û ew bên jiyandin. Her windahiyek wan her tim ez êşandime. Ji bo min gotin, “Ew kurê xwedawendê ye”. Min jî xwest ez bibim kurekî (zarokekî) hêjayî jinan. Vê yekê rêgeza (hêmana) bingehîn a têkoşîna min diyar kiriye. Min ji bo jinan, “Rêgeza Hêviyê” pêş xist. Min got, “Pêwîste her jinek azad bibe”. Wekî mêrekê, min jî bi pîvanên etîk û estetîk ên li gorî azadiyê şekil girtine, xwe terbiye kir. Min got, Rêgeza bingehîn a Sosyalîzmê azadiya jinê ye.''

Bi avakirina qadên xweser a jinan, avakirina artêşbuna jinê û her wûha rêxistinbuna jinê û birdoziya wê re rêya ku digihejê azadiya jinê û jiyanê heri dawi jî bi Jineolojî ve gihiştiye encamê û wekê ku Serokatî jî tine ser ziman êdi projeya wê ya nivço mayi temam dibe û dor tê jiyanî kirina vê. Êdi jin xwedi birdozi, rêxistin, artêş û zanist e. Zanista jin, jiyan û hevjiyanê; Jineolojî encamê xeyal, armanca Serokatî jî zarokati heya vê rojê ye.

Em çiqas xeyalên Serokatî parve dikin? An jî xeyalên me yên xwedî asoyên fireh a mîna yê Serokatî hene?

Jineolojî xeyalên hemû jinên azadixwaz û lêgerinvan di hundirê xwe de dihewine û ji bo rizgariya jî her curê amurên zayendperest, olperest, netewperest û zanistperest ji me re derîyeki vedike. Heger xeyalên me mîna Serokati mezin hebe û em li pêy lêgerina vê de bin dikarin ji bo xwe gihandina vê gelek tiştan bikin û tu carê dev jê têkoşinê bernedin.

Ji ber kû watedayina jiyanê bi wate jiyan kirina jinê re gengaz e.



# Ji çiraxên hunera Kurdî

**Can Yûsif**

Hunermend Hesen Dêrikî

“Bilbilê Indîwera rengîn û dengê awaza berxwedanê”

Hunermend û stranbêjên Kurd rolek sereke lîstin di helperîna neteweyî ya Kurdî û Tevgera Rizgariya Kurdistanê de, xebatên wan yên hunerî bûne dengek zindî yê nasnameyê û amûrek çalak di berevaniya zimanê Kurdî û parastina mîrateya çandî ji winda bûn û pişaftinê.

Hunera wan ne tenê xweşbûnek bedewî bû, ew kiryarek berxwedanê bû û çekeke nerm bû di rûyê hewldanên têkbirin û paşguhkirinê de , stran kirin neynika bîra gel û awaz kirin wekî alaya rûmet û xweparêziyê.

Di dilê vê têkoşînê de, hunermendên Kurd ên ku dengê wan bi xemgîniya rojan e û neteweyî re tevlihev bûn, ew bûne çirax, riyên berxwedan û pêdariyê ronî dikin.

Bi rêya stran û şahkarên xwe, derd û êşên miletekî îfade dikin ku li lêgerîna xwe dike, û têkoşînê dike ji bo rûmet û azadiya xwe .

Di nav wan hunermendan de, Hesen Dêrikî wekî yek ji dengên resen ên Kurdî diyar dike ku barê netewî di awazên xwe de hildigire, derbirîna êş û hêviyên wê di stranên xwe de dike.

Tecrubeya wî ji nav dilê xwezaya Kurdî hate destpêkirin, stranên wî bûn berdewamîya xumxuma ava Dîcle, pestînên çiyayê Cûdî û sirûdên gundên Kurdî, dengê wî ne tenê şehyanek derbasbûyî bû, lê bawernameyekî zindî ye ji bo pêdarî û nasnameyê, û bangekî domdare ji bo parastina ziman û mirasê, şahideke ku hunera Kurdî dikare bibe mîna eniya berxwedana çandî û parastinê bike.

Di himbêza Kurdistanê ya kevnar de, li wir ku çîrok, dîrokê himbêz dike û dil bi hezkirina ax û azadî re dijene, xweza giyanê papîran û xewnên azadîxwazan li ser singa xwe xêz dike, hunermend û stranbêjê Kurd Hesen Dêrikî di sala 1981'an de ji dayîk û baveke Kurd (Hediyê û Resûl) hatiye dinyayê, di himbêza malbateke kurdperwer, welatparêz û kedkar de ku tijî ruhê welatparêziyê, evîndarê welat û dildarê azadiyê ku rêya bêhêvîtiyê qet nasneke û li ser rêça têkoşîn û fedakariyê di meşe û ji bo doza Kurdî, parastina nasname û çanda wê, ji wendabûn û têkçûnê tiştên herî hêja û giranbuha pêşkêş kir.

Hunermend Hesen di nav malbateka ku ji 12 zarokan pêk tê (9 kur û 3 keç) de di gundê Indîwera bedew de, li kêleka Çiyayê Cûdî yê bilind û nêzîkî Cizîra Botanê kela lehengan û xaka destanan, wargeha Memê Alan û Stiya Zîn mezin bûye.

Li wir, di vê cihê pîroz, rûhê wî di nav xwezayê de geş bû, wî zarokiya xwe derbas kir di bin sîberên darên “Kaniya Xeyda” û kovanên” Pira Bafit” a kevnare , li ser peravên çemê Dîcle û di navbera gelî û çiyayên wê de, di himbêza zevî û buxçeyan de, li wir ku çîrok wek çîçekên biharê belav dibin.

Jêhatîbûna wî ya muzîkî û simfonîya jiyana wî a yekem li ser awazên xuşîna “Kaniya Qulteyîn”, xumxuma pêlên”Ava Mezin”, mişmişa “Çemê Siqilan” û pestînên vedenga bayê Çiyayê Cûdî û dengê çîvçîva çûkan, qepqepa kewan û pestînên pirpirîkên bedew ku li ser şitlên gulan digirin dîlanê, hate avakirin.

Ev hemû deng bûn dibistana wî ya yekem, ji wan bedewtirîn awaz, xweşiktirîn melodî û ciwantirîn stran di hundirê wî de hatin hûnandin, wî dengê welatê xwe û hewesa neteweyekî ku namire û qet jî nakeve, bi xwe re hilgirt da ku vedenga hunera wî bimîne mîna şemalekî ronahî bide rêyên hêvî û azadiyê.

Di temenek zû de, dema ku ew heşt salî bû wî xwe berdida nava dilan û ew fêr dibû pêlpêlokên xwezayê û ji awaza bayê, bi baldarî guhdarî stranbêjiya xwemalî ya gundan dikir ku bêdengiya zevî û helkeftan dişkîne, li wir di nav dewat û bênderan de, di civatên serûlî û çîrokan de, hunêra wî dest pê kir û rêya xwe şopand bê peymangeh û mamosteyan.

Hesen di destpêka ciwanîya xwe de, di sala 1995'an de tevlî “Koma Cûdî” ya hunerî bû, ji çavkaniyên wê yên xweşav, bingeh û zanistên stranbêjîya Kurdî fêr bû, ji wê çavkaniyê ruhê huner û kelepûrê wergirt û dengê wî li cejnên Newrozan û helkeftan bilind dibû, carnan bi şahiyên gelêrî re hevrê dibû û carnan jî êşên civakê himbêz dikir, heya ku ew bû dengê gundê xwe, sazumanê rewşa wê û vedenga birîn û xewnên wê yên girêdayî mane.

Di demekî kin de navê wî di navbera hezkerên hunera rastîn a Kurdî de belav bû. Ji ber ku rewaha wî rastiyek dihewand ku xwe berdida nava dilan, şîrîniyek ku hûnandî ji êşeke veşartî û germiyek ku ji kûrahiya nasname, ax û xweparêziyê derdikeve.

Di pêşxistina wî ya hunerî de,(birayê wî Mehmûd, hunermend Ehmed Ferman û Diljan Cûdî) jî destek dan wî .

Di dawiya sala 2005'an de ew zewiciye û ew bavê sê zaroka ye ( du kur, Rewend û Ela , yek keç bi navê Êlîn).

Destpêka rêwîtiya wî ya hunerî di sala 2007'an de bi hunermend Ednan bavê Hêco re bû, dema ku stran û muzîk wekî rêyek ji bo îfadekirina xwe û nasnameya xwe hilbijart, piştî du salan, wî komeka hunerî ya taybet bi xwe saz kir ji bo vejînkirina konser û dewatan, dengê wî zû di nav hezkerên hunera resen a Kurdî de belav bû, heya ku navê wî di civatan de dihate gotin, wekî vedenga hesreta kevn û qêrîneka hêvîya nû.

Wî stranên folklorî ên herî bedew di giyanek hemdem û awazên şêrîn yên ku giyanan şad dikin, diherikin nava dilan, stranên wî ne tenê peyvên derbasbûyî bûn, lê helbestên germ bûn ku bi nîşanên ax û nasname yê tijî bûn, bi xunava zarokatiyê û xwêya hesretê û bi tayên berxwedan û hêviyê hatibûn hûnandin.

Wî strandiye ji bo welat, şoreşê, şehîd, azadî û şoreşgeran, ji bo jina Kurd a berxwedêr û ji bo kesên ku ji bîr çûyîn ku çîrokên wan kesekî ne gotî. Dengê wî bû vedenga birînanên ku nayên dîtin û alayek ku di asîmanê wijdana Kurdî de pêl dide.

Wî bi dehan stranên şoreşgerî û welatparêzî pêşkêş kirine di pîrozbahiyên neteweyî û cejnên Newrozan de, ji nav stranên wî yên navdar :

1-Gulek min hebû (gotin û awaz: Diljan Cûdî)

2-Hatim Zaxokê (gotin û awaz: Şevger Mîrza)

3- Zindana te jiyane (gotin û awaz :Diljan Cûdî)

4 -Dewre were (gotin û awaz : Şevger Mîrza)

5- Sêwana me QSDe (gotin û awaz: Rûmet Elî)

6-Kobanê (gotin û awaz: Menan Cafer)

Hesen Dêrikî ne tenê dengek ji dengên Kurdistanê yê azad e, lê ew nebeza wê ya zindî ye, şahidê demeke derbasbûyî û hêvîyek ku her dem nû dibe, hunera wî ji kûrahiya axê , ba û avê derdikeve.

Ew çîrokên bav û bapîran vedibêje, tovên peyva azad di dilê her kesê ku lê guhdar dike diçîne, di stranên xwe de peyama azadîyê hildigire û awaz kire çekek di rûyê zulmê de, dengê xwe kir fenerek ku ronahiya wê qet melûl nabe, her çiqas şev dirêj bibe jî.

Bi rêya stranên xwe, ew li ser êş û hêvîyê diaxivî, li ser kok û azadîyê, li ser dîroka gelekî ku şikestinê naxwaze, xebatên wî dê bimîne pirek di navbera nifşan de û çîrokeke tê gotin ji bo her kesê ku bawer dike ku huner zimanê herî rastî yê giyanê ye û hêztirîn amûra berxwedanê ye.

Ew fêrî stranbêjiyê bû li ser ritma bayê û di bin bandora stranên dayikan, serûliyên palevanan, nimêjê û zikrên dapîran di şevên dirêj yên zivistanê de.

Di zarokiya xwe de bi şêwazê pêşengên strana Kurdî a neteweyî bi bandorbû, ji mîrasê hunermendên mezin vexwar ên wekî :(Mihemed Arîf Cizrawî, Aram Tîgran, Erdwan Zaxoyî, Diyar Dêrsim, Beyto Can, Îyaz Yûsiv û hwd...) .

Wî bi rêya stranên xwe û beşdarbûna hunerî, hêviya neteweyî ji nû ve zindî kir, xweşiya zimanê Kurdî di bedewtirîn awayên xwe de nîşan da, bi şermezarkirina hewldanên pişaftina çandî, bi karanîna huner wekî xeta parastina yekem a hebûna Kurdî, wî dengê xwe kir wekî neynikek ji rûhê gel re û hunera xwe kir mîna pirdarek ku nifşan bi çîroka mezin a welatek ku navê wê Kurdistan e pêve girê bide.

Wî xebatên stranbêjiyê tomar kir ku şopeka wî ya taybet di wan de diyarbû û tê de dengê şêrîn bi peyva armancdar re û mîrateya muzîkê bi hestên hevdem re tevlihev kir.

Wî bi helbestvan û awazdênerên pabendîkar re hevkarî kir, nivîsarên xwe bi baldarî hilbijart, di van bîst salên borî de, pênc albûmên stranên folklorî yên Kurdî (Şêxanî, Koçerî û Dugavî) weşand , zêdetir



ji 30 videoklîpên stranên şoreşgerî û welatparêzî pêşkêş kir. Ji nav klîpên wî yên herî navdar:

1-Ezê Îro aşiq bim (gotin û awsz : Masûd Cizîrî)

2-Zimanê min kurdî ye (gotin û awaz: Şevger Mirza)

3-Efrîn wara evînê (gotin û awaz: Ferhad Bîgendî)

4-Cenga Rojava (gotin û awaz: Elî Mensûr)

5-Şehîd Egîd (gotin û awaz: Bedran Bavê Bilind).

Ew beşdarî gelek pîrozbahiyên neteweyî û konserên stranbêjiyê li derveyî Herêma Cezîre û Rojavayê Kurdistanê bûye,dengê wî hebûneka taybet hebû di vejîna şahiya 15 Tebaxa 2018'an li kampa Mexmûr û pîrozbahiya Newroza 2025'an li Libnanê, her weha di konserta hunerî ya bilind de ku li otêla Şîratonê li bajarê Halepê hatî lidarxistin, da ku bibe vedenga dengê azadiya kurdî li herderê cîhanê.


Hesen Dêrikî bi koma Cûdî û Hunergehê re û di gel komek hunermendên Kurd re, beşdarî pêşkêşkirina çend stranên welatparêzî bûye bi awayekî komekî, pê ezmûna xwe ya hunerî xurt kir.

Û ji sala 2020 heta îro, ew wek pêşkêşkerê bernameyek hunerî ya bi navê (Tevna Hener) li ser ekranê kenala Rojava dixebite, deng û afrîneriya xwe kire di xizmeta doza xwe û gelê xwe de, bi temamî hewl dide da ku mirasa hunerî û çandî ya Kurdî ji winda bûn û jibîrkirinê biparêze, di dema rêwîtina xwe de ya vê bernameyê, wî hêjmarek hunermend û stranbêjên navdar ên kurd ji Rojava û ji yên hatine vê deverê kirine mêvanê xwe, da ku vê sehneya xwe bike paceyek vekirî ji bo dengên resen û hestên Kurdî.

Stranên wî neynikek bû ji bo dozeka ku hesretbûna azadiyê dike, ji bo wijdana ku di bin barê zordarî û derbiderkirinê de di nale û ji bo dengê neteweyekî ku di tevliheviya ji bîrkirinê de li xwe digere.

Di her awazekê de, wî tovên hişmendî û hêvîyê belav dikir ; di her peyvekê de, çîrokên bav û kalan û xewnên nifşan digot; di her straneke de, ruhê axa kurdî ya serhildêr hildigirt , ku hîn jî li berxwedide ji bo mayîn û nûjenbûnê.

Bi vî rengî Hesen Dêrikî, bi deng û stranên xwe, bû yek ji stûnên hunera neteweyî ya kurdî, parêzvanekî mirasa çandî, û dengek ku di asîmanê azadiyê qet venamire.



## Wêjeya berxwedanê

**Remezan Olçen**

Xelatên Nobelê yên îsalê hatin eşkere kirin. 9'ê Cotmehê xelata wêjeyê hat destnîşankirin. Nivîskarê Macar László Krasznahorkai xelata îsalê wergirt. Krasznahorkai xwedan gelek berhemên hêja ne. Di pirtûkên xwe de atmosfereke weke qiyametê disêwirîne. Ji ber ku li gorî nêrîna wî qiyamet ne bûyerek lê rewşeke domdar e, ew didome.

Di pirtûkên xwe de xerabmaliya sosyalîzma reel û bêrehmiya pergala kapîtalîst a li ser civaka Macar bi hostatî dibêje. Ew vê rewşê weke qiyametê dibîne. Herifîn û rûxîn hêdî hêdî dibe, xwe tekrar dike ev felaket. Mirovahî di nava vê felaketê de hewl dide ku bi awayekî bijî û li ser piyan bimîne. Hêvî û bêhêvîtî di zik hev de cereyan dikin. Di romana Satantango de behsa gundekî dike ku di nava çiravê de maye. Melankoliya Berxwedanê yan jî Şer û Şer sahneyekê bi varyantên cuda datîne holê. Di nava rûxînê de bi mirovan re lêgerîna li hêvî û maneyê disêwirîne.

Pirsa ku serê xwe pê dêşîne ev e; di vê dinyaya ku ji aliyê pergala serdest ve hatiye herifandin, nîzama xwezayê hatiye xerakirin, gelo rêyeke din heye, gelo derketina ji vê rewşê mimkûn e? Ew dema behsa ketina mirovahiyê dike di heman demê de dixwaze şêweyên bêdeng ên berxwedanê jî nîşan bide. Li vê derê berxwedan ne bi rêya çekê tê kirin, berxwedan çalakiyeke ruhî û bi hişmendî ye. Li gorî wê, bûyîna xwediyê gotina xwe, îtîraza li ber zilmê, fikirîn, ferqkirina xweşikahiyekê jî dibe şêweyeke berxwedanê.

Ji ber ku li gorî Krasznahorkai wêje-edebiyar stargeha dawî ya mirovahiyê ye.

Ev şêwenêrîn û berxwedana gelê Kurd li cihekî digihîjin hev. Serhatiya Kurdan jî weke romanên Krasznahorkai ye. Di nava qiyameteke domdar de Kurd li wate û maneya jiyaneke nû û azad digerin. Kurd di bin zext û tehdeya qirkirina serdestan de ku ziman li wan hatibû qedexekirin bi rêya çîrokên xwe, bi rêya dengbêjan karîbûn, bi zimanê xwe, hebûna xwe biparêzin. Ma ne Rêber Apo bi xwe dibêje; Dema min li dengê Aram Tîgran guhdar kir, min got divê ev deng-ziman tine nebe. Strana ku Rêber Apo guhdar kirî “Delal” e. Behsa Dewrêşê Evdî dike ku ji bo welat çawa bi mêrxasî şer dike. Edûla delal li ser Dewrêş dibêje. Di strana Delal de jî rewşeke weke qiyametê tê nimayîşkirin. Dewrêş tevî siwarên xwe di nava wê herifîn û qiyametê de li maneyê li wateya jiyan digere. Heta bi tenê lê nagere wê maneyê bi canê xwe çêdike. Ew di nava wê kaosê de rêyên mirovbûnê jî nîşan dide.

Em disa li romanên Krasznahorkai vegerin. Di romanên wî de derketin û rizgariya ji qiyametê tine. Lê lêgerîna ji bo çareseriyê heye. Ev lêgerîn îspata wê yekê ye ku mirov hîn jî weke mirovan dikarin tevî hebûna pergala serdest jî xwe çêbikin. Îcar li vir erka nivîskar jî ew e ku vê qiyametê û çîroka mirovên li rêyek digerin, bibêje. Heke nebêje; ew jî dibe şirîkê çêkirina qiyametê.

Hingê jê tê xwestin ku şahidiyeke exlaqî li rewşê bike û berxwedêran jî bibêje.

Pirs ev e; Dema rûxîna dinyaya em dizanin wê kî bikaribe gotina xwe bibêje û li gotina xwe bibe xwedî? Bersiva nivîskaran diyar e; wêje-edebiyat stara dawî ya mirovahiyê ye. Ji ber ku carna berxwedana gelekî di romana nivîskarekî/ê de ji nû ve diafire û dijî. Ew behrem dibe hilgira domandina wê berxwedanê din av nifşan de. Edebiyat j ime re dibêje; hîn neqediya ye.

# Bi hatina zivistanê re zor û zehmetiyên koçberên Kampa Serêkaniyê zêde dibin

Koçberên Kampa Serêkaniyê bi hatine zivistanê re êş, zor û zehmetiyên wan zêde dibin. Hevserokê Kampa Serêkaniyê Ebdulrezaq Mihemed diyar kir ku pêwîstiya koçberên kampê bi pêdiviyên sereke hene, ji ber vê yekê pêwîst e rêxistinên navdewletî destekê bidin koçberên kampê.

**Dîlan Mulhim\Hesekê**

Di sala 2019'an de dewleta Tirk a dagirker êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir, di encamê de bajarê Serêkaniyê û Girê Spî hatin dagirkirin. Di heman demê de, gelên van bajaran ji ber hovîtiya çeteyan bi darê zorê, ji cih û warên xwe hatin derxistin, herwiha Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji bo bicihkirina van koçberan, kampa Serêkaniyê ava kir. Di nava Kampa Serêkaniyê de hezar û 700 malbat hene, lewra 6 salin ku Serêkaniyê ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hatiye dagirkirin û hate niha jî dagirkirin berdewam e. Ev 6 sal in berxwedanî di bin şert û mercên herî zehmet de tê meşandin. Koçber hemû astengî û zehemtiyan bi têkoşîneke mezin derbas dikin û hêviya vegera mal û milkên xwe jiyan dikin. Koçberên li kampê ruxmî ku kamp ji xwe re kirine cih û war, lê belê di vegera li mal û milkên xwe de bi israrin.

Di derbarê rewşa kampa Serêkaniyê de, hevserokê kampê Ebdulrezaq Mihmed ji Rojnameya me re axivî.

**'6 sal in gelê Serêkaniyê di nava şert û mercên herî giran de jiyan dikin'**

Ebdulrezaq Mihmed anî ziman ku 6 salin gelên Serêkaniyê di nava şert û mercên herî giran de jiyan dikin û wiha got: "Di nava kampa Serêkaniyê de koçber rastî gelek êş, astengî û zehmetiyan tên, ev 6 salin dewleta Tirk a dagirker bajarê Serêkaniyê dagir kiriye, mal û milkên gelên wî bajarî talan kirin e. Di heman demê de, bi hate zivistanê re êş, zor û zehmetiyên koçberan di nava kampê de zêde dibin. Herwiha bi hatine zivistanê re bi şert û mercên giran ên avhewaya hişk a li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, êşên koçberên ku ji ber dagirkeriya Tirk û çeteyên wê ji herêmên xwe koçber bûne, zêde dibin. Pêwîst e rêxistinên navdeweletî destekê bidin koçberên kampê. Ji ber ku divê demê de pêwîstiya koçberan bi pêdiviyên sereke yên zivistanê hene."

**'Kampa Serêkaniyê ji aliyê UNECF ve ne naskirî ye'**

Ebdulrezaq Mihmed eşker kir ku heta niha kampa Serêkaniyê ji aliyê UNECF' ve ne naskirî ye û wiha berdewam kir: "Piştî ketina rêjîma Baas û hatine hikumerta veguhêz a Sûriyê, gelên Sûriyê kêfxweşiya xwe dan xuyakirin. Di heman demê de, koçberên herêmên dagikirî ji kêfxweşiya xwe ji bo vê yekê dan xuyakirin ku piştî ketina rejîma Baas vegirin cih û war xwe. Lê mixabin ev kêfxweşiya wan hate şikandin, ji ber ku ev hikumeta veguhêz a Sûriyê bi hişmediyeke tundirew desthildariyê birêve dibe. Herwiha hewl dide ku vê hişmendiya xwe li ser gelê Sûriyê ferz bike. Hikumeta veguhêz a Sûriyê heta niha tu çareserî jî pirsgirêka koçberan re ne dîtiye."

**Rêxistinên di nava kampê de dixebitin**

Rêxistinên ku di warê tenduristî de ,di nava kampa Serêkaniyê de kar dike, Heyva Sora Kurd e. Herwiha rêxistinên ku di warê dabînkirina pêwîstiyên sereke de, rêxistina Rîlê, rêxistina IRC in. Ji aliyê van her du rêxistinan ve rêvebirin û çêkirina pêwendiyan ji bû dabînkirina xizmetguzariyên av û paqijiyê li kampê tê kirin, herwiha dabînkirina xwarinê jî, ji aliyê wan ve têkirin. Di heman demê de, hin rêxistin hene mehnewî alîkariya koçberên kampê dikin. Ev saleke 55 malbatên koçber yên Serêkaniyê ji dibistanan derbasî kampê bûne, tu rêxistinan alîkariya wan ne kirî ye. Di heman demê de, di nava kampa Serêkaniyê de, Mala Jin, Weqfa Jin, Kongra Stra hene, yên ku di aliyê jinê de dixebitin."

**'Li gorî derfetên Rêveberiya Xweser em destekê didin koçberên kampê'**

Mihmed anî ziman ku ew li gorî derfetên Rêveberiya Xweser destekê didin koçber di nava kampa Serêkaniyê de û wiha pê de çû: "Rêveberiya Xwesr tenê destekê dide koçberên kampa Serêkaniyê û ji aliyê rêxistinên navdewletî ve



alîkarî kêm in. Herwiha em hewl didin di demeke nêz de pêdiviyên sererke yên zivistanê li koçberên kampê belav bikin. Koçberên kampê di aliyê kêmbûna avê de gelek êş û zehmetyan dikşînin û bi taybet di werzê Havînê de, bajarê Serêkaniya yê ku kaniya avê bû, niha gelê wê bi hisreta avê ne û bê av jiyan dikin. Av ku digihêje koçberên kampê bi riya rêxistinên nava kampê ye, lê ev yek kêm e û ne zêde ye.

Koçberên kampa Serêkniyê ev şeş salan di nava êş û zehmetiyan de jiyan dikin, herwiha pêwîstiya kampa Serêkaniyê bi pêwîstiyên girîng heye, mîna guhertina kon anjî çadirênên kampê, belavkirina mazot û guhertina konên kampê bi giştî. Pêwîst e her sal konên kampê werin gihertin, lê ev 6 salan konên kampê ne hatine guhertin. Ji ber vê yekê pêwîst e bi aweyekî lezgîn konên kampê werin guhertin."

Hevserokê kampa Serêkaniyê Ebdulrezaq Mihmed axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Banga min ew ku rêxistênên navdewletî bi erkê xwe yê mirovî rabin û destekê bidin Koçberên Kampa Serêkaniyê."



**Hilbijartinên Sûriyê**

Hafiz Ahmet Turhalli

5 Cotmehê li Sûriyê weke pêkenîn û leystikekê hilbijartin hatin lidarxistin. Hê salekî wan temam nebûye ku dewletên Îngîlîz, Qeter, Îsraîl, Amerîka û Tirka ew birin Şamê. Hilbijartina ji bo Parlemana Sûriyê ku niştecîhên wê, pir reng û pir dengin ji nedîtîve tên. Gelo Eqilmendên vana kî ne û di kîjan demêde dijîn?

Ev Hilbijartin li gor kîjan pîvanan pêk hatin? Pêvanên olî, yê demokrasîyê an jî yê dîktaron e? Ev hilbijartin ne weke tu hilbijartinan e.

Min li parlemanterên ku nav hilbijartî, lê ne jihêla gel ve ji hêla Colanî ve neqandî mêze kir, hemû kesên derûdora wî û kesên sîxurên dewleta Tirk in.

Tê zanîn ku ev hişê hilbijartinê hişê dewleta Tirk e. Ji ber ku şanoyekî bi vê rengî tenê Tirk karin bileyzin.

Ger vana misilmanin û behsa Îslamê dikin, di ola Îslamê de dibêje ger hûn karekî civakî bixwazin bikin, divê hûn ji hêla gelê wê herêmê ve werin hilbijartin. Li gor şert û mercên îro dema hûn bixwazin bireveberîya civakekî bikin an karekî civakî pêk bînin, divê hûn ji hemû kesên pêwendîdar pirsiyar bikin.

Bi gotinna îroyîn, herin hilbijartinê, herin referandumê.

Ji milletê ku tu dixwazî birêve bibî, divê tu razîbûna wan bigrî.

Ayeta Qur'ana pîroz rê nîşanî rêvebiran dike:

„Ew banga Xwedayê xwe dişopînin û Nimêjên xwe rast û durust dikin. Dema karekî civakî dikin bihev dişêwirin. (Şura 38)

Ev pîvanên birêvebirinê yên li gor Qur'ana pîroz in. Dema mirov pîvanên Qur'ana pîroz û kiryarên vana dide berhev, mirov dibîne ku çiqas ji Qur'anê dûrin. Rihê wan, kumê serê wan û gotina Allah û Ekberê tu ji destê wan bigrî, tu tiştekî wan li holê namîne.

Lê di meseleya xapandina oldar û gelan de gellekî şarezan e. Olfiroşîyekî zîrek dikin. Ji xwe ev desthelatdarî bi destê Emewiyan kete nava Îslamê û misilman hatin jehrî kirin.

Di dîroka misilmanan de meseleya Hekeman heye. Piştî şerê di navbera Hz Alî û Muawiye de ku Muawiye ber bi têkçunê ye, Rupelên Qurana pîroz dikin ser şûr û tîrên xwe derdikevin meydana şer. Piştî wê ji bo xwîn zêde neyê rêtin du hekeman tayin dikin û dibêjin bira ew sernavê civakê biryaran ji millet re bêjin:

Ebu Musayê El Eş'erî dibe nunerê Hz Alî û Amr îbnul-As jî Nunerê Muawiyê.

Tên Ji hz Alî re dibêjin bira xwîn neyê rêtin tu dev ji xelîfetiye berde, ewê Muawiye jî dev jê berde.

Alîgirên Muawiye dibêjin berê bira Nunerê Hz Alî ji gel re bêje ku wî ji îro şunde dev ji birevebirinê berdaye. Musayê El-Aşarî derdikeve ser dikê û dibêje ji vir û şûnde, Elî dev ji birêveberiyê berda.

Piştî wê nunerê Muawiye derdikeve ser dikê û dibêje ey millet: we bihîst; Elî dev ji xelîfetiyê berdaye û ji vir û şunde Muawiye xelîfeye. Bi dek û dolaban birêveberî ji destê Hz Elî û alîgirên wî derdixin. Ew roj ev roje, misilmanan huzur û rehetî neditiye.

Colanî, DAÎŞ û alîgirên wan jî, dibêjin em şopdarên Emewîyane. Ev meselaya hilbijartinê û dekû dolabên wana ji dîroka Emewiytanin.

Jibîr dikin; dîrok di wê derê de ma û bi taybet gelê Kurd hişyar e û xwedan hêz e. Mirovên îro jî ne ê wê demê ne! Hilbijartinê derewîn ew ê bibe kemîna wan. Cîhan durrutiya wanan dibîne, desthelata cîhanê ewê heta dawiyê wan bikar bîne û piştre tiştê layiqê wan liwan vegerîne.

# Hac Yûnis... Kevintirîn xwaringeha xwarinên gelêrî

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Li bazara "Mamar Paşa" ya li bajarê Qamişlo, xwaringeheke biçûk bi karekterê xwe yê gelêrî heye. Ew di nava xwe de çîrokeke zêdetirî 90 salî vedhewîne. Ew xwaringeha Hac Yûnis e ku wekî kevintirîn xwaringeha bajêr tê naskirin û avakirina wê vedigere sala 1933'an.**

Xwaringeha Hac Yûnis ji aliyê zilamekî Ermenî yê bi navê Aram ve hatiye avakirin, di sala 1933"an de ku ew ji Nisêbînê hatibû bajarê Qamişloyê, ev xwaringeh bûye cihek ji bo hezkiriyên çêja resen û mîrata herêmî. Bi taybetî kesên temen mezin.

Tevî ku xwaringeh geleriye û ne zêde mezine, ew bûye sembola bîra kolektîf a bajêr, ku niştecihên Qamişlo ji hemû pêkhateyan li wir dicivin da ku li ser heman sifrê bixwin. Xwaringeha Ermenî ya Hac



Yûnis ne tenê wekî cihekî xwarinê ye, lê di heman demê de wekî beşek zindî yê bîr û dîroka civakî ya cihêreng a Qamişloyê ku cihê xwe jî diparêze.

**Xwaringeha xwarinên gelêrî diparêze**

Piştî wefata Aramê Ermanî, yek ji xebatkarên wî Hac Yûnis ê ku ew ji 9 saliya xwe ve li cem wî kar dikir karê wî berdewam kir. Piştî ku Hac Yûnis nexweş dikeve kurê wî Zuhêr Yûnis kar û xebatên xwegirngehê bi rêve dibe.

Kurê Hac Yûnisê yê bi navê Zuhêr Yûnis ku temenê wî 54 sale dema ku bavê wî nexweş dikeve cihê wî digre û karê wî berdewam dike ji bona ku çanda xwarinên gelêrî yên civaka xwe zindî bihêle wiha dibêje: "Min ji 12 saliya xwe ve dest bi alîkariya bavê xwe dike û di karên xwaringhê de cihê xwe digre û ji dil û can kar û xebata xwe dide meşandin, lê piştî ku bavê wî nexweş dikeve, wê demê temenê wî 20 salîbû, lê ji mecbûrî rêveberiya xwaringehê dikeve ser milê wî."

**Xwaringeha Hac Yûnis bi xwarinên xwe nav û deng e**

Xwaringeha Hac Yûnis dikeve Kantona Cizîrê û ji aliyê xwarinên xwe yê gelêrî ve bi nav û denge û gelek warinên mîna: Şorbe, serûpî, zûzê qelandî û lefên mertedêla karê destê wan û hin xwarinên gelêrî yên din têne amedekirin.

Xwaringeha Hac Yûnisê tevî şert û mercên zehmet yên ku têre derbas dibe, lê tucarî kar û xebatên xwe yên çêkirina xwarinê nesekinandiye û xwaringeh her roj xelkên bajêr pêşwazî dike. Şêfê xwaringeha Hac Yûnis Zuhêr Yûnis wiha dibêje li ser zehmetiyên bi wan re derdikevin: "Ji ber guhertina rewşa bajêr ji demên berê ê destpêka avakirina xwaringehê, xwaringeh hin caran rastî astengiyan tên ku ji milê aborî ve van astengiyan dikşînin, em bi vê xwaringehê debara jiyana xwe dikin, lê carinan em dikevin rewşin zor û zehmet de, ji ber buhabûna kelûpelên xwarinê." Hêjayî gotinê ye ku ev xwaringeha gelêrî ne tenê cihek e ji bo xwarinê, lê pencereyek e ji bo dîroka Qamişloyê, çîroka bajarekî vedibêje ku tevî hemû zehmetiyan jî geş maye.



# Serhat Eren; Muxatabê aştiyê li ser masê nebe... Ew aştî ne pêkan e

Parlementerê DEM Partî yê Amedê Serhat Eren diyar kir ku pirsgirêka herî mezin di pêvajoya aştiyê neavêtina gavên berbiçav yên ber bi demokratîkbûnê ji aliyê dewletê ve û wiha got: "Bêdengkirina çekan girîng e, lê ev bi tena serê xwe aştiyê garantî nake. Aştî bi rêya qanûn û demokrasiyê tê pêkanîn."

**Amara Baran/ Navenda Nûçeyan**

Di derbarê banga Aştî û Civaka Demokratîk û kar û xebatên Komisyonê, Parlementerê DEM Partî yê Amedê Serhat Eren bersiva pirse Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha ye:

**-Pişte banga Aştî û Civaka Demokratîk li Tirkiyê pêvajoyeke nû dest pê kir gelo pêvojo niha di kîjan astê de tê meşandin?**

Ji bo fêmkirina vê pêvajoyê, divê em hinekî paşve vegerin. Di vekirina Parlamentoyê de di 1'ê Cotmeha 2024'an de, bi destdayîn û silavkirina serokê MHP Dewlet Bahçelî bi koma Partiya DEM re bingehek ji bo diyalogê ava kir. Û mijara tecrîda li Îmraliyê bi berdewamî hate rojevê. Bahçelî di axaftina xwe ya, parlementoyê ya di 22 ê Cotmeha 2024'an de, diyar kir ku ji bo rakirina tecrîdê, divê Abdullah Ocelan were parlementoy "hilweşandina tevgerê di nav koma Partiya DEM de ragihîne" ku bikaribe mafê xwe yê hêviyê bikar bîne. Ev nirxandinên Bahçelî hem ji bo qebûlkirina hebûna tecrîdê û hem jî ji bo têgihîştina rola Rêber Apo girîng bûn. Piştî demeke dirêj cara yekem di 23'ê Cotmehê de hevdîtinê malbatê bi Rêber Apo re çêbû. Di hevdîtinê de Rêber Apo peyamek pir zelal da:" Ger şert û merc guncaw bin, ez xwedî hêza teorîk û pratîkî me ku vê pêvajoyê ji bingeha şer, pevçûn û tundûtûjiyê veguhezim bingehek qanûnî û siyasî." ev nirxandinên Rêber Apo rêveçûna pêvajoyê da destnîşankir.

Piştî hevdîtina ku di 28'ê Kanûnê de li Îmraliyê bi şandeyek ku Pervîn Buldan û Sirri Sureyya Onder jî di nav de bûn pêk hat, Rêber Apo diyar kir ku nûkirina tifaqa Tirk-Kurd berpirsiyariyek dîrokî ye û divê hemî derdorên siyasî ji bo aştiyê xemên teng bidin aliyekî.

Rêber Apo di 27'ê Sibata 2025'an de, bangek dîrokî kir: "Divê hemû kom çekên xwe deynin û PKK divê xwe fesix bike." Di bersiva vê bangê de, PKK di 5-7'ê Gulanê de kongreya xwe ya 12'emîn lidar xist û biryara hilweşandinê ya ku di kongreyê de hatibû dayîn di 12'ê Gulanê de bi raya giştî re parve kir. Di 11'ê Tîrmehê de, çek li Silêmaniyê bi merasîmek fermî hatin şewitandin. Piştê îmhakirina çekan, di 5'ê Tebaxê de, Komîsyona Demokrasî ya Hevgirtina Xûşk-Biratiya netewî li Meclîsa Tirkiyê hate damezrandin. Komîsyonê heta niha 12 civîn li dar xistiye û niha qonaxa xwe ya guhdarîkirinê temam dike û amade ye ku di Cotmehê



de raporek bi pêşniyara qanûnê pêşkêşî Parlamentoyê bike.

Piştî 27ê Sibatê, qonaxa yekem bi piranî qediya; niha divê em derbasî qonaxa duyemîn bibin. Sê têgehên ku Rêber Apo tekez kir ji bo vê qonaxê mifteya vê yekê civaka demokratîk, aştî û entegrasyona demokratîk e. Entegrasyona demokratîk beşdarbûna civakê di pergalê de bi maf û rûmeta xwe ye; ew ne asîmîlasyon e, lê naskirina mafên kolektîf ên li ser bingeha hemwelatîbûna wekhev e.

Ev qonaxa duyemîn amûrên berbiçav hewce dike qanûnên veguhêz/demkî. Divê çarçoveyek qanûnî ya berfireh were damezrandin, ku vegera kesên ku ji ber sedemên siyasî, di girtîgehan de ne, ji ber dozan ji qanûnê hatine dûrxistin, ji çiyayan heta deştan ve bigire nav xwe. Ji ber vê yekê veguherîna Komîsyonê ji "guhdarîkirinê" ber bi "qanûnî" ve girîng e.

Pêdiviyeke din a girîng ew e ku rewşa fîzîkî ya Rêber Apo were baştirkirin û rê li ber bi awayek rihet hevdîtinan bi beşên cuda yên civakê re were vekirin. Divê hevdîtinên bi parêzer, malbat û komîsyon û şandeyan re bi awayekî periyodîk werin çêkirin ku kapasîteya danûstandinê, motora pêvajoyê bi awayek lez karibe bixebite.

**-Rêber Apo mîmar û pêşengê pêvajoya aştî û civaka demokratîk e. Lê belê, ew hîn jî di tecrîdeke giran de ye û mafê hêviyê jê re nayê dayîn. Komîsyonê di vî warî de çi gav avêtine?**

Îro, her kes dizane ku Rêber Apo damezrîner û sermuzakerevanê rastîn ê vê pêvajoyê ye. Gotinên wî yên "Ger şert û merc guncaw bin, ez dikarim vê pêvajoyê ji bingehek pevçûn û tundûtûjiyê veguhezim pêvajoya qanûnî û siyasî," ku wî di hevdîtina yekem a malbatê de got, di bingeh de tevahiya rêya destnîşan kir. Ev nirxandin rêya aştiyê, hem ji hêla dîrokî ve û hem jî ji hêla siyasî ve nîşan dide. Ji ber vê yekê, mayîndetiya aştiyê û avakirina civakek demokratîk bi beşdariya rasterast a Rêber Apo bi pêvajoyê ve girêdayî ye.

Lêbelê, em îro jî bi rastiya tecrîdê re rû bi rû ne. Civînên sînorkirî yên ku her çend meh an hefteyan carekê têne lidarxistin, vê tecrîdê ji holê ranakin. Her çend Rêber Apo ajokarê vê pêvajoyê be jî, divê di civînan de ti pirsgirêk tune bin. Ji bo bidestxistina vê yekê, divê şert û mercên wî werin baştirkirin û pêşxistin.

Wekî Partiya DEM, em di derbarê mafê hêviyê de pir zelal in. Biryarên Komîteya Wezîran a Konseya Ewropayê zelal in. Rêber Apo bi xwe ev yek ne tenê wekî "mafek", lê wekî "prensîbeke hêviyê" ku ji bo her kesî derbasdar e, anî ziman. Ev cudahî pir girîng e. Mesele ne tenê azadiya kesekî ye, lê vekirina rêyek aştiyê ji bo tevahiya civakê ye.

Ev rastî di xebatên Komîsyonê de bi berdewamî hate tekezkirin. Endamên Partiya DEM tekez kirin ku hevdîtinên birêkûpêk ên Rêber Apo bi parêzer û malbata xwe re, her weha têkiliya rasterast bi Komîsyonê û şandeyên siyasî re, ji bo ku pêvajoya aştiyê bixebite girîng in. Nêzîkatiya me zelal e: Azadiya Rêber Apo ji bo pêşveçûna pêvajoyê pêdivîyek stratejîk e. Ger mafê wî yê hêviyê neyê naskirin, tecrîda wî neyê bidawîkirin.

**- Ji bo ku pêvajoya aştiyê mayînde be, divê çi gav bên avêtin?**

Pirsgirêka herî mezin di vê pêvajoyê de neavêtina gavên berbiçav ên dewletê ber bi demokratîkbûnê ve ye. Bêdengkirina çekan girîng e, lê ev bi tena serê xwe aştiyê garantî nake. Aştî bi rêya qanûn û demokrasiyê tê bidestxistin. Di vê qonaxê de, divê şert û mercên Rêber Apo demek dirêj hatiba baştirkirin û hawîrdorek ku ew bikaribe tê de bi azadî bixebite bihata afirandin. Niha, divê pêvajo derbasî qonaxek din bibe. Ji bo ku ev pêvajo bi dewletê re bi şert û mercên wekhev were danûstandin, divê muxatabên aştiyê Rêber Apo fîzîkî azad bibe ku ew bi beşên cûda yên civakê, nûnerên siyasî, akademîsyen, dîroknas, lêkolîner - hemî beşên civakê re bi awayek azad diyalogan pêş bixe. Ger ev qonax were derbaskirin, pêşveçûn dikare pir zûtir be.

Têgeha krîtîk li vir "entegrasyona demokratîk" e, wekî ku ji hêla Rêber Apo ve hatiye tekezkirin. Entegrasyona demokratîk tê vê wateyê ku mirov bi nasname, ziman, bawerî û çandên xwe hene, û bi vî rengî beşdarî jiyanek hevpar dibin. Ne hilweşandina gelan û ne jî veqetandina gelan ji hev çareserî ye. Ya ku bi rastî girîng e, naskirina her kesî ye, tevî cûdahiyên wan, li ser bingeha hemwelatîbûna wekhev. Entegrasyona demokratîk bingeha siyasî ye ji bo ku nasnameyên cihêreng bi mafên wekhev û li ser bingeha rêzgirtina hevbeş bi hev re bijîn.

Eger guhertin di Qanûna Dij-Terorê û Cezayê ya Tirkiyeyê de neyên kirin, eger qeyûm bi dawî nebe û eger astengiyên li pêşiya zimanê Kurdî neyên rakirin, lawaziya vê pêvajoyê dê berdewam bike. Ev di heman demê de pêvajoyek demokratîkbûnê ye ku hemî warên jiyanê digire nav xwe. Ew bi siyasetê ve sînordar nine; veguherînek rizgarker di hemî warên civakî de, di nav de huner, werzîş, perwerde, edalet, medyayê, azadiya jinan û ekolojiyê, hewce ye. Îro, hîn jî zextek giran li ser çapemeniya Kurdî heye. Ev rewş nîşan dide ku geşbîniyek cidî ya li ser pêvajoyê heye.

**-Komîsyona Demokrasî û Hevgirtina Xûşk-Biratî ya Netewî ya ku di Meclîsa Mezin a Tirkiyeyê de hatiye damezrandin heta çi astê xebat daye meşandin, wê çibike?**

Ev komisyona ku ji hêla Rêber Apo ve hatiye pêşniyar kirin, bersivê dide hewcedariya mekanîzmayeke sazûmanî ji bo çareseriyeke demokratîk piştî bidawîbûna pevçûnê. Avakirina komîsyoneke wiha ji hêla Parlamentoyê ve îradeya siyasî ya di pabendbûna Tirkiyeyê de ji bo hembêzkirina pêvajoya aştiyê nîşan dide. Rêber Apo jî girîngiyeke mezin da komîsyonê, bi berdewamî rola wê di xurtkirina bingeha civakî û nîqaşkirina qanûnên veguhêz de teqez kir.

Heta niha, komîsyonê 12 civîn li dar xistine. Li gorî Serokê Meclîsa Netewî ya Tirkiyê Numan Kurtulmuş, bi 91 rêxistinên civaka sivîl û kesan re nîqaş hatine meşandin, zêdetirî 50 demjimêran xebat hatiye kirin û 830 rûpelên qeydan hatine berhevkirin. Gelek kes, ji Dayikên Aştiyê bigire heya welatiyên ku di pevçûnê de zarokên xwe winda kirine, baroyan, rêxistinên civaka sivîl ên herêmî, sendîka û rêxistinên jinan, ji bo komîsyonê hatine vexwendin. Herwiha, serokên berê yên parlementoyê, navendên ramanê û saziyên lêkolînê nêrînên xwe li ser pêvajoyê parve kirin. Ev tomar destkeftiyek girîng di tomarkirina bîra civakî û siyasî ya pêvajoya aştiyê li Tirkiyeyê de temsîl dike. Rûxmê van hewildanan jî kêmasiyek cidî heye, Komîsyon hîn rasterast bi Rêber Apo re ango damezrînerê sereke yê pêvajoyê re neciviye. Lêbelê, ji bo pêşveçûna pêvajoya aştiyê, ev ne hilbijartinek e lê pêdivîyek e.

**- Gelo komîsyon plan dike ku serdana Îmraliyê bike? Partiya DEM li ser vê mijarê çi dibêje?**

Wekî Partiya DEM, em ji destpêkê ve vê dibêjin: Mûxatabê pêvajoya aştiyê zelal e. Ev pêvajo bêyî nêrînên Rêber Apo tamam nabe. Heta niha, komîsyonê guh daye gelek beşdaran bê guman ev bi qîmet in, lê ne bes in. Ji ber ku mifteya aştiyê li Îmraliyê ye.

Ez dixwazim vê yekê pir zelal bibêjim: Serdana komîsyonê ya Îmraliyê ne daxwazek e, lê pêdivîyek e. Hemû ezmûnên aştiyê yên li çaraliyê cîhanê vê yekê nîşan didin. Mandela li Afrîkaya Başûr li ser maseyê bû, nûnerên Sinn Féin rasterast beşdarî pêvajoyê li Îrlanda Bakur bûn û li Havana ya Kolombiyayê bi rêberên FARC re civîn hatin lidarxistin. Xala hevpar a van mînakan ev e: Mûxatabê aştiyê li ser masê nebe, Aştî pêş nakeve.

**-Nêrînê we li ser rola sereke ya Rêber Apo di pêvajoya aştiyê de û hewldanên hikûmeta AKPê yên ji bo manîpulekirina vê pêvajoyê li gorî berjewendiyên xwe çi ne?**

Îro, her kes dizane ku Rêber Apo aktorê sereke yê vê pêvajoyê ye. Beriya banga wî ya dîrokî a 27'ê Sibatê, ne mimkun bû ku çek bêdeng bibin û rêxistin xwe hilweşîne. Di civînên berê de, wî rêya aştiyê bi gotina "Ger şert û merc guncaw bin, ez dikarim vê pêvajoyê ji bingehek pevçûn û tundûtûjiyê veguhezim platformek qanûnî û siyasî" destnîşan kiribû. Bi gotineke din, Rêber Apo ne tenê ji bo gelê Kurd, lê ji bo hemî gelên Tirkiyeyê navnîşana çareseriyê ye. Lê mixabin, meylên ku vê pêvajoyê li gorî berjewendiyên xwe şekil bidin jî hene. Rêber Apo gelek caran diyar kiriye ku divê ev pêvajo bi "hesabên teng" neyê meşandin. Lêbelê, li şûna ku pêvajoyê wekî destpêşxeriyek demokratîkbûna civakî were dîtin, hestek heye ku mirov wê wekî amûrek ji bo xurtkirina pozîsyona xwe ya siyasî bihesibîne. Ev samîmiyeta pêvajoyê têk bibe. Nêzîkatiya me zelal e: Divê aştî ne bi berjewendiyên teng ên taktîkî, lê wekî destkeftiyek hevbeş a stratejîk were dîtin. Wekî Partiya DEM, em di her fersendê de tînin bîra xwe: Rêya aştiyê di beşdarbûna rasterast a Rêber Apo di pêvajoyê û demokratîkbûna Tirkiyeyê de ye.

# ‘Nenavendîbûn bihêzkirina gel e’

Endama Deseteya Hevserokatiya Meclisa Sûriya Demokrat Şêra Osê tekez kir ku nenavendîbûn ne gefeke, lê bihêzkirina gel e û wiha got: “Nenavendîbûn rêya avakirina sîstemeke medenî û demokratîk e her kes tê de beşdar dibe û rêzê ji cihêrengiya herêmê re dike.”

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Bi salan li Sûriyê dewleteke navendî dihat meşandin, vê yekê bi xwe re gelek aloziyên kûr anî. Lewma jî li Sûriyê kirîz derket pêş, lê piştî hilwişandina rêjîma Baas hêviyek hebû ku gelê Sûriyê bi awayekî baştir û bi tevlîbûna hemû pêkhateyan, Sûriyeke nû ava bikin û bi wekhevî tê de bijîn, pêkanîna vê hêviyê jî bi nenavendîbûnê pêk tê.



Derbarê sîsetema nenavendîbûnê û şîrovekirina wê, ku ne şêweyekî parçebûnê ye, lê yekbûna Sûriyê misoger dike, endama Deseteya Hevserokatiya Meclisa Sûriya Demokrat MSD’ê Şêra Osê ji rojnameya me re axivî.

### ‘Navendî dûrî hewcdariyên gel e’

Şêra Osê da zanîn ku navendîbûn dûrî hewcedariyên gel e û wiha anî ziman: “Şêwayê navendiyê ew e ku hemû desthilatên-siyasî, îdarî, aborî û ewlehî di destê desthilata navendî de li parêzgehê ye. Herwiha biryarên çarenûsî û rojane ji cihekî têne tê girtin ku dûrî hewcdariyên gel e ku aliyên din weke pêkhateyên dîtir di herêmê de dijîn, ne xwedî biryar in. Ev nimûne dihêle ku dewlet lawaz bimîne, derfeta civakê û herêmê jî lawaz dike ku bikarîbe xwe îfade bike û kar û barên xwe bi rê ve bibin.”

### ‘Nenavendî bi hêzkirina gel e’

Şêra diyar kir ku nenavendî ji bo bihêzkirina gel e û wiha domand: “Nenavendî ew e şêwayekî ku biryaran parve dike, rêveberiyên herêmî yên hatine hilbijartin rêveberiya kar û barên herêmê di aliyê xizmetguzatrî, aborî û rêveberî dikin. Herwiha dozên serweriya giştî weke siyaseta derve û parastinê di destê dewleta navendî de ye. Nenavendî nayê wateya parçekirina welat e, lê bi hêzkirina gel e ku bi awayekî rasterast tevlî îdara jiyana xwe ya rojane dike.”

### ‘Navendî bû sedema teqandina aloziya Sûriyê’

Şêra Osê diyar kir ku sîstema navendî bi demdirêjî li Sûriyê hatiye pêkanîn û aloziyên mezin bi xwe re derxistiye û wiha got: “Yek jê paşguhkirina erdnîgarî û civakî ku tenê li ser pêşketina xizmetguzarî û pêşketina Şamê disekinî û piraniya parêzgehên din ji mafên xwe bêpar diman. Berhemên welat ên sererd û binerd di destê dewletê de bû weke dewlemendiya netewî bi taybet petrol, sotemenî û çandinî, tenê ji bo berjewendiyê hin kesan dihat birêvebirin, gelê Sûriyê hîs nedkirin ku bi edaletî tê parvekirin. Herwiha bîroqratiya welat hatibû xetimandin ku biryar bi awayekî hêdî dihat kirin bêyî rastiya li herêman bê naskirin. Di heman demê de dûrxistineke siyasî hebû ku nûnertiyeke rastî ji bo pêkhateyên Sûriyê be tune bû û şêwayê hikumê yek alî bû. Ev binpêkirin rasterast bû alîkar di hîskirina zilim û paşguhkirinê, herwiha bû yek ji sedemê sereke di teqandina aloziya Sûriyê ya sala 2011’an.”




### ‘Nenavendiya demokratîk deriyê avakirina sîstemeke medenî û nûjen vedike’

Şêra Osê destnîşan kir ku nabe Sûriya nû li ser heman bingehên ku hişt Sûriyê bighêje asta parçekirinê û şer bê avakirin û wiha axivî: “Îro nenavendî rêya rastî ji bo parastina Sûriyê ye, ji ber ku nenavendî di nava xwe de van xalan dihewîne; hemû pêkhate bi awayekî adil beşdarî çêkirina biryaran dibin. Bi edaletî jêder di navbera hemû parêzgehan tê belavkirin. Gel di aliyê rêveberiyê de bi hêz dibe û dikare kar û barên herêma xwe bi xwe bi rê ve bike, bêyî ku li bendî biryarê ji navendê bimîne. Yekîtiya niştimanî di rêya beşdarbûneke dilsozî ku ne bi rêya nefretê, xurt dike. Em di Meclisa Sûriya Demokrat MSD’ê de dibînin ku navendiya zêde tê wateya domandina aloziyan, di heman demê de nenavendiya demokratîk deriyê avakirina sîstemeke medenî û nûjen ku cihêrengiya gelê Sûriyê fêm dike, vedike.”

### ‘Tecrûbeya nenavendî alternetîfeke serkeftî pêşkêş dike’

Şêra Osê tekez kir ku tecrûbeya nenavendî ya ku li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye avakirin îsbat dike ku ev nimûne dikare alternatîfelek bi serkeftî pêkêş bike û wiha got: “Weke me dît rêveberiyên herêmî yên hilbijartî hatin damezirandin ku bikarin kar û barên xwe yên rojane bi rê ve bibin. Jin û ciwan beşdarî cihên biryaran dibin, ev yek bi demdirêjî hatibû paşguhkirin. Nimûneyeke siyasî ku nûnertiya tevahiya pêkhateyan misoger dike hate afirandin. Nenavendî di pêşerojê de dikare aramiya siyasî bi xwe re bîne, ji ber ku tenê di destê dewletê de namîne û derfetê li pêşiya tevlîbûneke rasterast vedike. Hem jî pêşketinên aborî bi hevsengî bi saya parvekirina adil ji bo dewlemendî û îstîsmarkirinê dike. Hem jî dema ku welatî hîs bike ku dengê wî tê guhdarkirin û biryarên herêma wî li cihê ku jiyan dike tê dayîn, baweriya bi wê sîstemê xurt dibe.”


### ‘Nenavendbûyîna siyasî bijarteya MSD’ê ye’

Şêra Osê diyar kir ku ji destpêka damezirandina Meclisa Sûriya Demokratîk wan ji bo bidawîkirina aloziya Sûriyê, projeya nenavendiyê weke îstratîjiya xwe hilbijartiye û wiha got: “Karê me li ser du astan tê kirin, li ser asta hundirîn ku me nimûneya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê damezirand. Meclisên herêmî û şaredarî ava kirin, derî li pêşiya sandîka, yekîtî û rêxistinên sivîl vekirin, da ku beşdarî vê projeyê bibin. Qanûnên medenî ku misogeriya edaleta civakî û derfetên wekhev dike, derxistin. Hem jî me jin kir hevkareke di hukim û ciwan weke hêzeke çalak di biryara siyasî de. Li ser asta Sûriyê bi giştî me diyalog bi aliyên opozîsyonê û pêkhateyên din pêk anî, ji bo em tekez bikin ku projeya me ne taybetî ya yek herêmê ye, lê ew proje ji bo tevahî Sûriyê ye. Me kaxizên siyasî û însiyatîfên niştimanî ji bo çareseriya aloziya Sûriyê li gorî rêgeza nenavendiya demokratî pêşkêş kir. Li ser asta navdewletî jî me projeya nenavendî li hemû formên navdewletî pêşîniyar kir. Herwiha em tekez dikin ku çareseriya Sûriyê ne di rêya parçekirinê û navendiyê de ye, lê di rêya şêwayeke demokratîk û adil e ye. Di heman demê de em hewil didin ku civaka navdewletî ji bo piştgiriya aramî û yekîtiya Sûriyê îqna bikin.”

### ‘Daxwaza me projeyeke niştîmanî ye’

Endama Desetya Hevserokatiya Meclisa Sûriya Demokrat Şêra Osê anî ziman ku daxwaza wan pêkanîna projeyeke niştîmanî ye û axaftina xwe wiha qedand: “Nameya me ji bo gelê Sûriyê ew e ku nenavendîbûyîn ne tehdîd de ji bo yekbûna welat, lê ew garantiya rastîn e ji bo mayîna Sûriyeke yekbûyî û adil. Nenavendî rêya avakirina sîstemeke medenî û demokratîk e ku her kes tê de beşdar dibe û rêzê ji cihêrengiyê re dike. Nameya me ji bo civaka navdewletî re ew e ku em piştgiriyê ji bo tu aliyan naxwazin, lê em daxwaza projeyeke niştimanî dikin, projeyeke ji bo damezirandina Sûriyeke bi diyalog, ne bi dûrxistinê, lê bi qebûlkirina hev du, ne bi înkarê lê bi tevlîbûna her kesî û ne bi hegemoniyê.”

---



## Nasnameya Kurdî Berdewam e!

**Sînan Cûdî**

Siyaseta rejîma Baasê ya li hember herêm û nasnameya Kurdî li Sûriyeyê jiholêrakirina bîra civakî bû. Herêmên ku Kurd lê dijîn, bi taybetî xetên Hesekê, Qamîşlo, Efrîn û Kobanî, bûn hedefa projeya “Kembera Erebî” ya îdeolojiya BAASê. Ev proje di sala 1965an de hate pejirandin û di sala 1973an de bi fermî hate bicîhanîn.
Armanc ew bû ku li ser sînorê Tirkiyeyê “herêmeke tampon a Erebî” ava bikin. Bi rêya tenikkirina deverên bakurê Sûriyeyê yên ku Kurd lê serdest in bi niştecihbûnên Erebî hatiba guhartin. Di vê çarçoveyê de, erdên nêzîkî 200,000 Kurdan hatin desteserkirin, bi sedan gundên Ereb hatin damezrandin, navên Erebî li gundên Kurdî hatin kirin, û gundiyên Kurd neçar man ku koç bikin deverên din. Bi hezaran malbatên ku li dora Qamîşlo, Amûdê, Dirbêsiyê û Til Koçer dijiyan hatin bêmilk kirin; qanûnên reforma erdê ne ji bo Kurdan, lê ji bo eşîrên koçber ên Ereb hatin bikar anîn.
“Serjimêriya” 1962an yek ji êrîşên herî sîstematîk ên li ser nasnameya Kurd bû. Di encama vê serjimêriyê de, zêdetirî 120,000 Kurd wekî “biyanî” hatin ragihandin. Hemwelatîbûna wan hate betalkirin, zarokên wan nekarîn beşdarî dibistanan bibin, û ji wan re qedexe bû ku di saziyên dewletê de bixebitin. Hin ji wan wekî “ecenib” (biyanî) û yên din jî wekî “mektûmîn” (neqeydkirî) hatin dabeşkirin. Bi vî rengî, nasnameya Kurd ji hêla qanûnî ve nehat dîtin. Dewletê ne tenê hebûna Kurdan nas nekir, lê wan wekî “metirsiyek ewlehiya navxweyî” dihesiband.
Hebûna Kurdan di meqamên dewletê de jî di heman salan de bi awayekî sîstematîk hate paqijkirin. Di dawiya salên 1940an û destpêka salên 1950an de, hin efser û burokratên Kurd, nemaze yên ku ji Hesekê û Helebê bûn, di nav dewletê de erk bi dest xistin. Lêbelê, piştî darbeya 1963an, ev kesayet di paqijkirina kadroyan de ku di bin navê “Sosyalîzma Ereb” de hatin kirin, hatin paqijkirin. Bandora Kurdan di avahiyên leşkerî û îstîxbaratê de bi awayekî pratîkî ji holê rabû. Efserên ji Qamîşlî û Efrîn bi hinceta “cudaxwaziya gumanbar” ji artêşê hatin derxistin û ji ketina wan a nav dezgehên navxweyî û ewlehiyê hat qedexekirin. Rejîma BAASê hem astengiyên îdeolojîk û hem jî yên îdarî danîn da ku rê li ber Kurdan bigire ku bi dewletê re xwe nas bikin.
Ev pêvajo ne tenê bû sedema dûrxistina Kurdan ji temsîla siyasî, lê di heman demê de ji hilberîna çandî jî. Perwerdehiya bi Kurdî hate qedexekirin, hilberîna pirtûk û muzîka Kurdî hate krîmînalîzekirin, û peyva “Kurd” di belgeyên dewletê de wekî peyvek neqanûnî hate hesibandin. Pirtûkên dersê yên dibistanê ji Kurdan re wekî “Erebên çiyayî” dihatin binavkirin. Dema ku Kurdan nasnameya xwe diyar dikirin, ew ji ber “propagandaya cudaxwaz” dihatin darizandin. Binçavkirin û lêpirsînên ku ji hêla dezgehên îstîxbaratê ve li herêmên Kurdan, bi taybetî di salên 1980an de, hatin kirin, di bîra kolektîf de serdemek kûr a tirs û bêdengiyê afirandin.
Pêkanînên ku îro di bin rêveberiya Ehmed El-Şara de têne dîtin, berdewamiya vê şêweya dîrokî ne. Hikûmet hîn jî daxwazên Kurdan ji bo xweserî û hikûmeta herêmî wekî “gef li ser yekîtiya neteweyî” dibîne. Hikûmeta Şamê avahiya xweser a li Rojava wekî formeke siyasî ya rewa nas nake û ji danûstandinên rasterast bi nûnerên Kurd re dûr dikeve. Peyva fermî “cudaxwazên li bakurê Sûriyeyê” di gotara dewletê de guhertoyek nûjenkirî ya termînolojiya neteweperestiya erebî ye ku ji serdema BAASê mîras maye.
Lêbelê, tiştê ku pergala heyî cuda dike ev e ku zordarî bi awayekî fermî “îdarî” bûye. Li şûna bêxwedîkirina rasterast an koçberiya bi zorê, balê dikişîne ser ambargoyên aborî, sînorkirinên îdarî û zextên di bin navê ewlehiyê de. Lêbelê, têkiliya dewletê bi nasnameya Kurd re bi bingehîn neguheriye. Îdeolojiya BAASê hîn jî li ser demarên dewletê dimîne, nasnameya Kurdî wekî “pirsgirêkek” ji nû ve çêdike.
Sîstema BAASê, ku ji hêla îdeolojîk ve di bin siya qaşo sosyalîzma erebî de ji dayik bûye, hewl da ku peyzaja Kurdî hem ji nexşeyan û hem jî ji bîranînan jê bibe. Lê hewldan vala derket; gel ma. Îro, di bin desthilatdariya Ehmed El-Şara de, dengvedana vê berxwedanê hîn jî tê bihîstin. Nasnameya Kurdî berdewam dike, piştî her pêla zilmê formek nû digire.



# Mistefa Rêzan: Bi xebatên berê bersiva demê nayê dayîn

Nivîskar û rojnamevan Mistefa Rêzan diyar kir ku niha lêgerînek ji bo avakirina modêleke rêxistinê ya girêdayî Kurdên li Ewropayê dewam dike, ji ber bi xebatên berê bersiva demê nayê dayîn û got, “Ji bo bersivdayîna pêvajoyê, Kurdistaniyên li Ewropa divê şêwazê xwerêxistinkirinê saz bikin û xwe amade bikin.”

**Navenda Nûçeyan**

Derbarê xwendina Kurdên li Ewropa ji rewşa Kurdistanê re, herwiha kar û xebatê ji bo Kurdistanê didin meşandin, nivîskar û rojnamevan Mistefa Rêzan bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Gelê Kurd li Ewropayê guhertin û veguhertinên ku li Kurdistanê rû didin çawa dibîne û dixwîne?**

Yek ji qadên herî fireh li derveyî welat, ango li diaspora Ewropayê. Tê zanîn hejmareke zêde ya hebûna Kurdistaniyên derveyî welat, li cîhanê û li Ewropa zelal nînin, lê bi qasî hatiye zanîn derdora 4 milyonan kêmtir an jî zêdetir be. Bêguman ev 4 milyon Kurdên ku li diaspora Ewropayê dijîn, bandora guhertinên ku li welat û bandora ku li qada Ewropa yan jî li cîhanê pêk tê, li ser wan heye. Şopandina Kurdistaniyan li Ewropayê, bêtir bi rêya ragihandina medya Kurdî û ragihandina azad a Kurdî çêdibe. Mirov dikare bêje di van salên dawî de baldariya ku dihat xwestin a ji Kurdên li Ewropayê, ne wek salên berê ye, hinekî cûdatire. Demên berê asta beşdariya Kurdistaniyan di nav çalakî, festîval û gelek deveran de bi sed hezaran bû, her diçe ev hejmar zêdetir dibe. Bêguman bandora jiyana Ewropayê li ser Kurdistaniyên li Ewropayê heye, ji aliyê standartên jiyanê, seatên kar û heta xwe li şet û mercên Ewropayê îyar kirin e. Lê beşê ku herî zêde hinekî baldare di van demên dawî de ji bo rewşa Kurdisatanê û guhertinên siyasî yên lê rû didin, ciwan in. Ciwan bêtir eleqedarî tiştên civakî û çandî yên girêdayî welatê ku lê dimînin. Bêguman hinekî sîstema asîmilasyonê yan van welatan ku ciwan bi xwe dike dûrî çand û zimanê xwe yê Kurdî heye, di vî warî rola bav û dê de bi bandore li ser wan, dema dê û bav zarokên xwe li ser çandî û kilitorî mezin nekin, wê bandora çanda welatên Ewropayê li ser wan çêdibe. Ji ber vê jî şopandina wan ji qada siyasî re bi wê re bandor dibe, bi jiyan li Ewropayê.



Di salên dawî de, di qada siyaseta ku li Kurdistanê rû dide hinek sistbûn heye. Lê kêm zêde guhertinên li her çar beşên Kurdistanê bandora wê li ser nêrîna gelê me li Ewropayê dike. Wek berê şopandina rojnameyên Kurdî yan rojnameyên ku ragihandina Kurd li Ewropa derdixe, di van salên dawî de kêm bûye ku bêtir bi rêya medya dijîtal hinekî rewşa Kurdistanê dişopînin. Di vir de beşdariya qada siyasetê kêmtir dibe. Niha pirsgirêkên bingehîn li Ewropayê di qada xwerêxistina gel, yanî beşdariya vê qadê ji avakirina meclisên çandî û hunerî, komele, beşdariya çalakiyan, hinekî kêmtire ji salên berê. Lê carnan hinek rewş an rojevên gerim ku li Kurdisatnê rû didin, ev hejmar tê guhertin û wek xwe namîne.
Wekî din guhertinên ku vê dawiyê li Tirkiyayê dest pê kiriye pêvajoya çareseriya aştî û siyasî ji aliyê gel ve li Ewropayê bi awayekî gerim hate pêşwazîkirin. Pêvajoya Rêber Apo ya ji bo çareseriya aştiyane û avakirina civaka demokratîk, bandor li ser nîqaşên li Ewropayê kir û atmosfêreke nîqaşekî kûr heye. Hem jî bêbaweriya girseya gelê Kurd li Ewropayê ji aliyê helwesta hikumeta AKP’ê heye ku nedirste di gavavêtinên xwe ji bo çareseriyê. Di vir de gel hinekî biguman nêzîkî helwesta hikumetê û partiyên desthilatdar dibin ku partiyên sîstema Komara dewleta Tirk ne bi birayrin pêvajoya çareseriyê bînin serî, lewma bifikarin di vî alî de. Lê bi pêvajoya Rêber Apo dest pê kiriye ew heta dawî pê bawer in ku aliyê Kurd ji bo pêvajoyê gavên herî pêwîst avêtine.
Mijareke din ku bala xelkên herêmê dikşîne heye, ew jî girtiyên di zindanan de ku cezayên heta hetayê li ser wan hatiye danîn. Konseya Ewropa behsa mafê hêviyê kir, lê heta niha dewleta Tirk di wî alî de sozên ku hatibû xwestin nayîne cih, gel jî li hemberî vê bifikarin. Hem ji hêla Komeleyên Mafên Mirovan heta saziyên tibî hatine eşkerekirin ku girtiyên nexweş û yên astengdar di zindanan de nikarin li girtîgehê bimînin, lê ew nayên berdan. Ev nîşaneya ku dewleta Tirk nebibandore gavan bavêje di vî warî de.

**-Ji bo temamkirina kar û xebatên ku li Kurdistanê ji bona doza Kurdî û têkoşîna tê meşandin, gelê Kurd li Ewropa heyanî çi astê di nava amedebaşiyê de ye?**

Yek ji nîqaşên di nava Kurdistaniyên li Ewropayê de tê meşandin ku êdî ji niha û pê ve wê şêwazê rêxistina gel li her qadê çawa be, li çar beşên Kurdistanê û li derveyî welat ev mijarê nîqaşan e. Lewma di vî warî de bendewarî heye ku hinekî awayê xebatên li her derê Kurdistanê û li derveyî Kurdistanê zelal bibe. Alternatîfa rêxistinên gel ên di bin bane saziyên navenda civaka demokratîk de li Ewropayê û li gelek deveran bi rêbaz û awayê berê xebat nayê meşandin, ji ber bi awayê berê bersiva demê nayê dayîn. Bêguman xwefesihkirina PKK’ê bandor li tevahî Kurdistanê kir ku êdî ji niha û pê ve wê awayê xebatê çawa bibe hinekî ne zelalî heye. Lewra lêgerîneke ji bo vê pirsê çêdibe û ji bo ku li gorî pêvajoyê amade bibe, divê şêwazê xwebirêxistinkirinê li her derê Kurdistanê û derveyî wê zelal bibe.
Niha li qada Ewropayê di vî alî de nezelalî heye, ji ber ew jî bi rewşa Kurdistanê ve girêdayî ne ku pêvajoya çareseriya aştî û avakirina civaka demokratîk li Kurdisatnê ber bi ku ve biçe û çiqasî biencam bibe hîn ne diyar e.
Israr heye û qenaetek çêbûye ku bi modêlên rêxistinên berê gel çawa xwe birêxistin dike, ji komele bigre heta navenda çand û hunerê, navendên civaka demoratîk û heta KCDK-E Ewropayê bi rengê berê nikare bersiva vê demê bide. Ji ber fakto, siyaset û guherînên mezin ku bi lez li Kurdistanê çêdibe, hem jî bandorên guhertinên li cîhanê li ser Kurdistanê, dihêle êdî ev modêlên rêxistinê li ser wan nîqaş pêş bikevin ku bi çi rengî gel karibe xwe li gor demê amade bike. Nîqaşekî gelekî kûr di van waran de heye, di bin banên tevgerên girêdayî koma civakên demoratîk ên Kurdistaniyên li Ewropayê KCDK-E. Êdî navenda civaka demoratîk li Faransa, Almanya û li deverên din ên welatên Ewropayê di vê çarçovê de civîn, nîqaş, agahdarî têne meşandin, heta di çalakiyan de şopandin li ser medya dijîtal li ser vê mijarê çêdibe. Lê modêla rêxistinê ji niha û pê ve KCDK-E li Ewropayê çawa xwe birêxistin bike ne diyare, ji ber nîqaş li ser wê xalê dewam dike. Gel meraq dike wê rewşa me û ya Gerîla çawa be, ji ber wê jî amadekariyeke ji sedî sed zelal wê çawa berpirsyara demê bide ser milê xwe, neyê zanîn. Encex di pêvajoya ku di şekil û şemayên rêxistinê zelal bibin û yên tevahî Kurdistan û derveyî Ewropa jî. Bêguman ev awayê rêxistinê wê demorkatîk be û pîvanên berê yên xebatê wê nederbasdar bin ku bêtir karibe li gor şert û mercên welatê li dimîne xwe birêxistin bike. Esas qanûn û destûra van welatan li ber çavan bê giritin bi pîvaneke demoratîk yasayî her xebat divê bê meşandin.

**-Heyanî çi astê civaka Kurd li Ewropayê hesasiyeta rewşa ku li welêt tê jiyankirin dibîne û dinirxîne? Û gelo ji bo wê di nava liv û tevgereke bi rêxistinkirî û rêk û pêk de ye?**

Derbarê mijara hestiyariya ku îro pêvajoya hatiye destpêkirin li Kurdistanê, li Tirkiyê û heta Rojhilata Navîn jî, ji her salên berê zêdetir hesasiyeteke di vî warî de heye. Ji ber niha di Rojhilata Navîn de ev sîstemên ku nikarin xwe li gorî demê biguherin, rastî êriş û destwerdanên derve tê ji Filistîn bigre, Lubnan, Sûriyê, Îran, Îraq û heta di Tirkiyayê de jî. Gel li Ewropa vê hesasiyetê dibîne, dibê em ê nebin mînaka van sîstemên ku niha rastî mudaxeleyên derve hatine. Ji ber vê jî ev hesasiyeta demê ku niha tê dîtin ji aliyê girseyên gel li her derê Ewropa ji Alamaniya bigre heta Faransa hemû pêvajoyê bi hişyarî û bi baldarî dişopînin. Heta pêvajoyên ku li Filistîn û Lubananê rû daye, li Sûriyê, Îraq û lêdana Îranê, van demê dawiyê de tevliheviyên ku Tirkiyê dest pê kirine, gel vê bi hesasiyet dişopîne, bêtir meraq dike ka ji niha û pê ve çi gav wê were avêtin.

Di encamê de niha lêgerîneke ji bo avakirina modêleke rêxistinê ya girêdayî Kurdên li Ewropayê dewam dike. Konferans û gelek civîn tên lidarxistin, hem jî festîval û gelek çalakiyên aktîvîtên Kurdistaniyên li Ewropa di vê demê de çêbûne. Nîqaş ji meheke derbasbûyî û vir ve li bende zelalbûnekê ne ku ka wê şekil û şemayên xwebirêxistinkirina Kurdistaniyên li Ewropayê wê çawa bibe di vê pêvajoyê de. Her kes jî bi encam bûye ku modêleke nû pîvanên demokrasî gerek bingeh bên girtin, demokrasiya dîrek a gel ku gel beşdarî her xebat û çalakiyan bibe, xwe birêxistin bike, pêvajoyê bişopîne, bighêje encamekê û bibe bersiva demê.
Êdî heta niha tepeserkirina Tevgera Azadiya Gelê Kurdistanê ji hêla hêzên dagirker nema tê qebûlkirin. Rewabûna van hêzên dagirker ên li Kurdistanê ku bi siyaseta berê nîzîkî Kurdistanê dibûn, nema rê li pêşiya wê heye, gel vê rastiyê jî dibîne. Ji bo ku karibe besivê bide vê gavê û pêvajoya Rêber Apo daye destpêkirin hewldanek heye ku çawa her beşekî Kurdistanê xwe birxistin bike, Kurdistaniyên li Diaspora Ewropa di nava her qada Ewropa û her welatî de li gorî şert û mercê xwe, wê êdî şêwazê rêxistina bixwe saz bike û xwe amade bike.

---

FENER



## Kî Peymana 10’ê Adarê Bin Pê Dike?

**Idrîs Henan**

Piştî hilweşîna rejîma Esad 8 Mijdara 2024an, koma cîhadîst a HTŞ, bi piştgiriyek navneteweyî ya plankirî li qesrên Şamê bi cih bû. Peyama yekem jî ew bû; Kî rizgar dike biryar dide. Li gorî vê têgihaştina desthilatdar jî dest bi avakirina sîstemek hişk a navendî kirin. Lê ji bo projeya demokratîk ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê zindî bûye bêwate bikin, destpêkê hewl dan maska demokratîk bixin ser rûyê xwe jî û pêkhateyên Sûriyê bixapînin. Lew re jî berê xwe dan wê herêmê û bi fermandarê QSD rêzdar Mazlûm Ebdî re Peymana 10 Adarê ya 8 xalî îmze kirin.
Eger mirov çavekî li 8 xalên Peymana 10 Adarê bixe û li pratîzekirina wan vegere, dê baş tebigihêje ka kî wê peymanê bin pê dike û hewl dide ji nav bibe.
Xala yekem ew bû ku di rêvebirina sazî û dezgehên Sûriyê de temsîliyetek demokratîk hebe ku bê cudahî hemû pêkhate li gorî jêhatîbûnê tevlî bibin. Lê tişta hatiye pratîzekirin, temsîliyetek tekalî li gorî hinek berjewenidiyên derneteweyî ên tayînkirî bûn. Di encamê de ev xal li hewa ma.
Li gorî xala duyemîn jî diviyabû ku gelê Kurd û mafên wî yên neteweyî di destûra bingehîn de werin naskirin, lê danezana destûrî gelê Kurd û mafên wî paşguh kir û welatperweriya Kurdan jî xiste mijara gumanê. Ev xal jî hîç nehat pêkanîn.
A sisiyan jî rawestandina şer û oparasyonên leşkerî li tevahiya Sûriyê bû. Ji xwe hewce nake mirov qalê bike ku tevayî xetên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di bin êrişên çekdarên HTŞ û yên Tirkiyê de ne ku hevdemî wê jî, li Beravê û Siwêda komkujî hatin kirin û vê dawiyê hewldan hebû ku li herdu taxên Helebê Çiyayê Seydo (Şêx Meqsûd) û Eşrefiyê komkujiyan pêk bînin. Ew jî bi cih nehat.
A çaran jî li ser integrasyona saziyên sivîl û leşkerî bû ku diviyabû komîteyên pispor bihatana avakirin û pêvajoya integrasyona demokratîk a saziyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi rê ve bibirana. Lê li şûna wê xwestin bi gefûguran saziyên Rêveberiya Xweser û QSD bihelînin û ji nav bibin. Ew jî çû ser darê.
Xala pêncemîn jî ew bû ku diviyabû hemû koçber vegerin cih û warên xwe û ewlehiya wan bikeve bin gerantiyê. Pratîk zêdek kesek venegerî û tam berovajî wê, desteserkirin û kiryarên li herêmên dagirtî, zêdetir bûn. Ew jî firî ser darê.
Li gorî xala şeşemîn a Peymana 10 Adarê, divê pitşgiriya dewleta Sûriyê di şerê li dijî paşmayeyên rejîma Esad û hemû gefên li dijî ewlehî û yekîtiya axa Sûriyê were kirin. QSD ji aliyê xwe ve gelek oparsyonên li dijî çeteyên DAIŞ pêk anîn, lê HTŞ bê deng ma û hewl da wê yekê biçewisîna ku hêza QSD lawaz bike. Ew jî di cih de zivirî.
Di xala heftan de tekezî li redkirina bangên parçekirina axa Sûriyê, xîtabên nefretê û hewldanên fîtneyê di navbera hemû pêkhateyên Sûriyê de hate kirin. Lê aliyê fermî de, hikûmeta veguhêz a HTŞ, çi îmkan û alavên ragihandinê yên di destê wê de ne, li dijî Elewî, Dirûz û Kurdan pêk tîne, komkujiyên li dijî pêkhatiyên Sûriyê rewa dike û gelan li dijî hev sor dike. Ji lew re bêbaweriya ku di nava gelan de mezin kiriye, hişt ku ev xal ji nedîtîve were.
Xala dawî, ya heştemîn, tekez kir ku; ji bona xalên vê lihevkirinê heya dawiya salê -2025- bi cih werin, divê komîteyên cîbicîkar werin avakirin ku bicihanîna heft xalên li jor bişopînin. Lê aliyê pratîk, desthilata veguhêz a HTŞ destek neda vê xalê û bi rêbazên xemsarî û demqezenckirinê ew xal jî badilhewa ma.
Di encamê de, heya ku li Sûriyê rêveberiyeke netewperwer ku nûnertiya hemû pêkhateyên welêt bike ava nebe û li gorî ruhê Peymana 10 Adar tev negere, mirov nikare li Sûriyê qala aramî, ewlehî û yekparabûna axê bike. Îca kî peymanê bin pê dike?